bas Kurdî

Heftenameya Nûçeyî | Hejmar: 03 | 16 - 22 Çile 2017 | basnews.com



Dengê kurdên Australyayê:
## Mistefa Xelîl

Mistefa Xelîl bêjer û damezrêner radyoya 2000 FMê ji Basê re behsa radyoyên kurdên Australyayê kir.

R14



Çi dikare dewleta kurdî ava yan xera bike?

R03



Strana Ellamezar e çîroka berxwedana ciwanên kurmanc ên Xorasanê

R09




Çemê çekuyanê qedîman:
## Kovara Vate

R11

# Pêngava serxwebûnê li Hewlêrê



Paytextê Herêma Kurdistanê Hewlêr bûye navendeka dîplomasîyê li Rojhilata Navîn. Çavdêrên siyasî balê dikişînin ser wê dîplomasîyê Herêma Kurdistanê û wê wekî sînyala serxwebûnê şirove dikin. Dihête çaverêkirin piştî derêxistina DAIŞê ji Mûsilê giştpirsî bo serxwebûnê bihête kirin.

Şandên PDK – YNK di nava hefteyê de li Hewlêrê civiyan. Piştî civînê polîtbûroyên herdu alîyan daxuyandin ku derbarê çareserkirina arîşeyên siyasî, darayî û muzekareya serxwebûnê digel Bexdayê wan desteyeka hevbeş ava kiriye û ew deste dê bo referanduma serxwebûnê kar bike.

R02

Di navbera bîranîn û bîr'ne'anînê de
## "Desteyek Ji Çîroka Jiyana Min"

R08

Surgunî ra agêrayîşê yew kilame:
## Kurdistan Kurdistan

R10

R10

Du pirtûk û awirek li Ewropaya Rojhilat
## Sefernameya G.G. Márquez li Ewropaya Rojhilat

R13



R12

## Kurdên Feylî kî ne?





Balexaneyên cîhanê
## Çend avahîyên bilind li Manhattanê

R13

# Pêngava serxwebûnê li Hewlêrê

MEHMED SALIH BEDIRXAN



Ajans û medyaya cihanî ji destpêka sala 2017an ve behsa dîplomasîya Herêma Kurdistanê dikin. Di nava du hefteyên derbasbûyî de Serokê Fransayê François Hollande, Serokwezîrê Tirkiyê Binali Yıldırım, Cihgira Serokwezîra Hollandayê Lodewijk Asscher, Wezîra Berevaniya Hollandayê Jeanine Hennis, Fermandarê Giştî yê Hollandayê Tom Middendorp, Wezîrê Derve yê Japonyayê Kentaro Sonoura serdana Kurdistanê kirin û digel Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî civiyan. Ji bilî serdanên bo Hewlêrê, Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî wekî nerîteka salane, bi armanca gihandina nêrîn û siyaseta giştî ya Herêma Kurdistanê û herwiha şîrovekirina pêşketinên siyasî û ewlekarîyê, digel hemû konsol û serokên nûnertîyên welatan ên li Hewlêrê civiya.

Çavdêrên siyasî yên balê dikişînin ser dîplomasîya li Hewlêrê, amajeyî wê çendê dikin ku sala 2017an dê bibe sala serxwebûna Kurdistanê û dîplomasiya astberz jî nîşaneyên wê çendê ne. Ligor zanyarîyên heftenameya Basê ji serkirdeyên siyasî yên Herêma Kurdistanê standî, dê di Çirîya Peşin a 2016an de referanduma serxwebûnê bihata encam dan, lêbelê Washingtonê Serok Mesûd Barzanî qane kir ku wê proseyê bihêle piştî rizgarkirina Mûsilê. Herwiha Washingtonê bo beşdarîya Pêşmergeyan di operasyona Mûsilê û serdana Serok Mesûd Barzanî bo Bexdayê de navbeynkarî kiriye.

Digel dîplomasîya serxwebûnê li Hewlêrê civînên duqolî yên navbera PDKê û alîyên din ê siyasî jî berdewam dikin. Serok Mesûd Barzanî, berî mehekê di peyamekê de bang li alîyên siyasî kir ku nakokîyan çareser bikin û parlementoyê aktîv bikin. Her bi vê armancê peyama Barzanî, berî bi du hefteyan desteya serkirdayetîya PDKê digel alîyên siyasî kom bû. Ligor zanyarîyên bidesxistî civînên YNKê û PDKê serkeftî bûne û herdu alîyan jî biryar liser wê çendê daye ku dîsa vegerin ser rêkeftina stratejîk û bo çareserkirina arîşeyan hevkarîyê bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re bikin.

**YNK – PDK desteyeka hevbeş ava dikin**

Di nava hefteyê de şanda YNKê digel şandeka PDKê civiya û di civînê de pirsgirêkên siyasî û aborî yên Herêma Kurdistanê hatin gotûbêj kirin û ragihandin ku ew dê piştgirî û hevkarîya Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin. Şanda YNKê di bin Serokatîya Cigirê Yekem ê Sekreterê Giştî Kosret Resûl de digel şandeke PDKê ya di bin Serokatîya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî de civiya. Di civînê de pirsgirêkên siyasî û aborî yên Herêma Kurdistanê hatin gotûbêj kirin.

Piştî civînê li navê polîtbûroya her du partîyan daxuyanîyeka hevbeş belav kirin û ragihandin; "di civînê de derbarê pêşxistin û guncandina pêwendîyan gotûbêj hatine kirin. Bi taybetî jî mijarên wekî hikumranî, pêwendîyên kurdistanî, pêwendîyên Herêma Kurdistanê yên digel hikûmeta Iraqê û welatên cîran re hatine nirxandin." Polîtbûroyên PDK û YNKê di daxuyanîyên xwe de amaje bi wê yekê jî kirin ku derbarê çareserkirina krîza darayî guftûgo pêk anîne û ragihandin; "piştgirî û hevkarîya hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin." Herwiha PDK û YNK aşkere dikin ku di civîna xwe de mijara peydakirina tedbîrên guncaw bo çareserkirina arîşeyan û bi taybet jî mijara çalakkirina parlamentoyê gotûbêj kirine.

Ligorî ragihandinê di civînê de biryar hatiye dayîn komîsyonek bê avakirin, ku nûnertîya hemû alîyên siyasî û pêkhateyên neteweyî ji bike; ev komîsyon dê mijarên wekî arîşeyên herêmên 140, referandum û serxwebûna Kurdistanê yekalî bike.

Di şanda PDKê de Nêçîrvan Barzanî, Fazil Mîranî, Izedîn Berwarî, Azad Berwarî, Mehmûd Mihemed, Dr. Roj Nûrî Şawês, Kakemîn Necar û Dilşad Şehab cih girtibûn. Di şanda YNKê de Kosret Resûl, Mele Bextiyar, Omer Fetah, Qadir Hemecan, Sedî Ehmed Pîre, Rizgar Elî, Erselan Bayîz, Cefer Şêx Mistefa cih girtibûn.

Pispor û rojnamegerên Herêma Kurdistanê balê dikşînin ser civîna YNKê -PDKê û amaje bi wê yekê jî dikin ku jiber rêkeftina YNK û Gorranê ber bi proseya hilweşînê ve diçe, YNKê bawerî bi wê çendê aniye ku dikare digel PDKê arîşeyên siyasî û darayî yên Herêma Kurdistanê çareser bike.

**Serxwebûn dê bihêt ragihandin**

Cefer Êmînkî Cihgirê Serokê Parlementoya Kurdistanê û Endamê Serkirdayetîya PDKê derbarê danûstandinên PDKê digel alîyên siyasî ji heftenameya Basê re ragihand ew liser pêşniyaza Serok Mesûd Barzanî bi hemû alîyan re danûstandinê dikin û ew di wê bawerîyê de ne hemû alî dê liser berjewendîyên hemwelatiyên Herêma Kurdistanê dîsan vegerin Parlamenta Herêma Kurdistanê. Êmînkî destnîşanîyê bi wê yekê jî dike ku aniha ew liser diyarkirina çarenivîsa miletê kurd kar dikin û gel dê îsal bixwe biryarê liser vê mijarê bide.

Hêmin Hewramî Berpirsê Pêwendîyên Derve yên PDKê jî derbarê dîplomasîya Herêma Kurdistanê de ji heftenemaya Basê re ragihand ku wan hertim hewl daye digel hemû welatên herêmî û rojavayî pêwendîyên baş durist bikin. Ew ti carî jibo ti welatan nebûne metirsî û azmûna wan a 25 salan jî îsbata wê çendê ye. Hewramî di beşeka din a axaftina xwe de behsa pêwendîyên Herêma Kurdistanê û îdareya Donald Trump Serokê Amerîkayê jî kir. Hewramî da zanîn ku piştî hilbijartinên Amerîkayê desteyeka astberz a Kurdistanê serdana Washingtonê kiriye û serkeftin ji kadrên Trump re xwastiye, di bersivê de, wezîr û berpirsên nû yên îdareya Amerîkayê jî piştevanîya xwe bo Herêma Kurdistanê dûpat kirine. Derbarê serxwebûna Herêma Kurdistanê de Hewramî wiha dibêje;" milletê me doza mafê diyarkirina çarenivîsa xwe dike û em liser dabînkirina vî mafî kar dikin. Serxwebûna Kurdistanê dê di demeke nêz de bihêt ragihandin.

## Mesrûr Barzanî:
## Hêvîdar im em bêjin Amerîka jî dostê kurdan e

Şêwirmendê Encumena Parastina Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ku serperiştîya şerê dijî DAIŞê dike, derbarê vî şerî û dîplomasîya Herêma Kurdistanê de ji kanala FoxNews a Amerîkayê re axivî. Barzanî peyamek pêşkeşî rêveberîya nû ya Amerîkayê kir û ragehand, ''hêvîdarim ji niha û pêde em bikarin bibêjin ji derveyî çiya, Amerîka jî dostê me ye."

Liser pirseka pêşkeşvanê bernameya Çirokên Şer de; Mesrûr Barzanî ragihand: ''em daxwaz ji rêveberîya nû ya Amerîkayê dikin, ku qurbanîdana me kurdan li ber çavan bigirin. me bona xatirê wan bîr û bawerî, û nirxên ku xelkê Amerîkayê rêz lê digirin qurbanî dane. Bawerîya me bi azadî, demokrasî, rêzgirtina mafê mirovan, azadîya dînî û pêkvejiyanê heye, jibo wê jî giring e Amerîka piştevanîyê li Herêma Kurdistanê bike." Derbarê dostanîya kurd û hêvîya xelkê Kurdistanê ya bi Amerîkayê de Mesrûr Barzanî diyar kir: ''gotineka kevin heye ku dibêje kurd derveyî çiya ti dostekî wan tune, ez hêvîdar im ji niha û pêde em bikarin bibêjin dervey çiya Amerîka jî dostê kurdan e.



## Kî ê pêşî cihabê bide ku Şerê Cîhanê ê Sêyem dest pê kiriye?

EKREM ÖNEN



Dema di dawîya Tebaxa 1939an de wek nûçegihanek vegerîya Polonyayê, Clare Hollingworth nizanibû ku ê mestirîn nûçeya sedsala 20an bide. Hînê 27 salî bû û çend roj berê li rojnameya Brîtanî The Telegraphê ketibû kar. Piştre ji Îngilterê dabû rê û hatibû gelîyê Katowiceê, Polonya, ku li ser sînorê di navbera Polonya û Elmanyayê de bû. Heta bi mehekê berîya hingê jî li Polonyayê kar kiribû jibo veguhastina penaberên sîyasî û Cihû û bi vî rengî alîkarîya 3500 kesî kiribû ku nekevin ber lepê Reicha Sêyem. Rojekê seyareya hevalekê xwe yê di Wezareta Karê Derve a Brîtanyayê de dixebitî jê wergirt û pişta wê ji ala dîplomatîk a bi seyareyê ve rast, berev sînor çû, ji dikanekê hinek pûl, şerab û aspirîn standin. Di vegerê de tiştekê bala wê kişand. Bayek rabû, potê (cawê) Hessian ê ku sînorê herdu welatan ji hev diqetand rabû hewa û tiştek dîyarî çavan kir: Bi sedan tankên Wehrmachtê (hêzên çekdar ên Nazîyan). Roja dinê rojnameya The Telegraph bi vî serenavî derket: "1.000 tank li ser sînorê Polonyayê civîyane – Deh yekîne amade ne jibo lêdanê"

Sê roj şûnde, 1ê Îlona 1939an, saet pêncê serê sibê, Hollingworth li otêla xwe ya li Katowiceê bi dengê tankên Elman ên di ber pencereya wê re derbas bûn şîyar bû. Wê gavê telefonî balyosxaneya Brîtanyayê a li Warşowayê kir lê dîplomatê li wir jê bawer nekir. Wê jî serikê telefonê di pencereya odeya xwe re derxist derve bo ku dengê tankan bibihîse. Herçî Wezareta Karê derve a Polonyayê bû, wan jî jê bawer nekir, çinku di gumana wan de hînê bi Elmanan re guftûgo dikirin. Lê tarîx dê vê jina ku hîn di destpêka kariyera xwe ya nûçegihanîyê de bû bi girîngtirîn nûçeya jîyana wê û a sedsala 20an wezîfedar bikira: ragihandina destpêkirina Şerê Cîhanê ê Duyem.

Clare Hollingwortha ku ji nîvsedsalekê bêhtir nûçegihanîya şer û cengan kir li deverên cûr bi cûr ên cîhanê, 10ê Çirîya Pêşîn (Cotmeh) a 2016an bû sed û pênc salî. Heftê sal piştî wê rojê, 2009, di hevpeyvîneka ligel The Telegraphê de wiha qala wê demê kir: "Ez çûm wê derê ku li penaberan, li kerr û korr û lalan binerim. Wexta ez li wir bûm, ji nişkê ve şer dest pê kir."

**Şerê Cîhanê ê Sêyem**

Albert Einstein di sala 1939an de, berîya ku şerê Cîhanê ê Duyem dest pê bike bi çend mehan, ji tirs û fikara ku zanyarên Nazîyan bombeya atomê bibînin û çêbikin, ji serokê Amerîkayê, Roosevelt, re nameyek şand û xwast Amerîka berî ku ew bombe bikeve destê Hitler li ser bixebite û wê çêbike. Eger Hitler berê ew bombe bi dest bixista, dê li ser koka dinyayê rûnişta. Li ser vê yekê Amerîkayê xebatên xwe yên li ser çekên nukleerî gurrtir kirin û çeka ku ê cenga duyem a cîhanê biqedanda çêkirin. Di hevpeyvîneka li gel wî a di 1949an de, gava jê pirsîbûn ku ê cenga cîhanê a sêyem bi kîjan çekan be, Einstein wiha bersiv dabû: "Ez nizanim Cenga Cîhanê a Sêyem dê bi kîjan çekan be, lê Cenga Cîhanê a Çarem dê bi dar û keviran be."

Van çend salên dawî, bûyer û rûdanên li seranserê cîhanê qewimîn çek, çarçove û wateya şer jî guhertin. Nemaze piştî 2014an bi qandî alavên şer, awayên şerî jî ji mirovan re bû pirs û mereq. Êdî ne dîyar e dengê tang û topan, derbaskirin û teribandina sînoran salixê çi didin. Di serî de DAIŞ, di encama şerên rêxistinên çekdar de li Iraq û Sûrîyê bi deh milyonan mirov ji cih û warên xwe bûn, bi sed hezaran mirov hatin kuştin, Ewropa bi êrîşên terorê ên li bajarên xwe û lehîyên penaberan ên li ber derîyên xwe ket nav krîzên mezin. Nivîskarekê Lubnanî ê ku vê havînê li ciyekê min guhdarîya axaftineka wî kir, piştî ku behsa hal û hewalên giran ên ku şerê Sûrî derxistibûn holê kir, vê tabloya dilsoj bi vî rengî pênase kiribû: "Ev karesata herî mezin e piştî Şerê Cîhanê ê Duyem."

Demeka kurt berîya niha, kuştina sefîrê Rûsyayê ê Tirkîyê destpêka Şerê Cîhanê ê Yekem, kuştina arşîduk Franz Ferdînand, anî bîra gelek kesan û li ser medyaya civakî pêşbînîyên li ser Şerê Cîhanê ê Sêyem hatin kirin. Hînê tu daxuyanî yan rûdaneka navdewletî ku vê wekî destpêka zincîre-şerekî hilsengîne nehatiye meydanê û tu dewleteka cîhanê bi îlaneka fermî amaje bi Şerê Cîhanê ê Sêyem nekiriye. Lê gelo ê tucarî fermiyeteka wek berê hebe? 13ê Îlona 2014an, rojeka şemîyê, Papa Francis serdana goristaneka li bakurê Îtalyayê kir. Sed hezar leşkerên Îtalyayê ên ku di Şerê Cîhanê ê Yekem de miribûn li wir hatibûn veşartin. Papa li wir behsa şer û pevçûnên li deverên cûr bi cûr ên cîhanê kir, talan û wêran û komkujîyên ku canê bi hezaran sivîlan ji wan distand bi bîr anî. Papa navê Şerê Cîhanê ê Sêyem ê "qetqetî" li tiştên dihatin jiyîn dikir û digot: "Ihtîyacîya mirovatîyê bi girî heye û niha divê em bigirîn."

Di Şerê Cîhanê ê Yekem de cara pêşî firokeyên şer bi awayekê berfireh di şeran de hatin bikaranîn. Di Şerê Duyem de jî cara pêşî çekên atomî hatin bikaranîn. Em nizanin Şerê Sêyem bi rastî dest pê kiriye yan ê bike yan dewam dike, lê em dikarin bibêjin ku piştî qedîya mimkun e di rûpeleka dîrokê de li serê wiha bê gotin: Cara yekem di vê cengê de înternet hat bikaranîn. Kamera û medyayên şexsî û gelemperî saniye bi saniye bênavber tomar dikin, iddîa dikin, radigihînin, çêdikin, diguherînin, xera dikin, diafirînin û bi zoomeka ecêb tiştên piçûk vê gavê mezin, tiştên mezin vê gavê piçûk dibin. Belkî serdema ku em hem herî pirr hem herî kêm dizanin ev e.

Eger tiştên diqewimin ne kêmî şerekê cîhanê bin û heta ji şerên berîya xwe girantir bin, nexwe pirseka ji pirsa "Şer ê kengî dest pê bike?" dijwartir heye li pêşîya mirovatîyê: Şer ê kengî biqede?

1)Leşkerên ji Hesseya Elmanyayê ên ku di dema cenga şoreşa Amerîkî de bi heqê xwe alî artêşa Brîtanî şer dikirin.

i)Cihab-dayîn: di zimanê devkî de di wateya ragihandina nûçe/hewalekê de tê bikaranîn.

# Çi dikare dewleta kurdî ava yan xera bike?



"Di ketwarî de, hilweşandina welatên wekî Yekîtîya Sovyetê encamine erênî hebû, ku bo nimûne welatên nûserbixwebûyî yên Baltîkê paşê bûne endamên YE, lê ev rastî li ber çavan nahête girtin. Dijberên perçebûna Iraqê herwiha li vê rastîyê, ku Rojhilata Navîn bixwe herêmeka bêseqam e û ji hejmareka dewletên heriftî wekî Iraqê pêk hatiye, çavpoşîyê dikin."

OFRA BENGIO

Navenda Moşê Dayan bo Vekolînên liser Rojhilata Navîn û Afrîqayê, Unîversîteya Tel Avîvê

Di van salên dawîyê de, delîveya ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê bikare xwe ji Iraqê veqetîne û serbixwe bibe ta radeyeka berçav zêde bûye. Sê ekolên hizrî teşe dane vatişa vê pirsê. [1] Ekola yekê îdîa dike, ku Kurdistanê hemî nîşanên dewleteke hene, loma ragihandina serxwebûnê tenê bi demê ve girêdayî ye. Ekola duyem hindekî biguman e û hokaran bi hindê ve girê dide, ku dariştina munaqeşe liser serxwebûnê tenê helmeteka taktîkî ye û zalbûn bi ser astengên li pêşîya wê de zêde zehmet e. Ekola sêyem destnîşan dike, ku berjewendîyên kurdan di mayîna bi Iraqê re ye û hilbijartina vê rêyê bijêreya herî mînende ye.

Boçûna sêyem di nav kurdan bixwe de zêde alîgir nînin; piştgîrî jibo vê ruwangehê zêde ji hêla dewletên cîran û komelgeha navneteweyî ve dihête kirin, ku bi awayekê siruştî dijberîya perçebûna dewletên heyî dikin, û ditirsin dabeşkirina Iraqê Rojhilata Navîn hîn bêhtir bêstiqrar bike. Di ketwarî de, hilweşandina welatên wekî Yekîtîya Sovyetê encamine erênî hebû, ku bo nimûne welatên nû serbixwebûyî yên Baltîkê paşê bûne endamên YE, lê ev rastî li ber çavan nahête girtin. Dijberên perçebûna Iraqê herwiha li vê rastîyê, ku Rojhilata Navîn bixwe herêmeka bêseqam e û ji hejmareka dewletên heriftî wekî Iraqê pêk hatiye, çavpoşîyê dikin.

Argumentên ekola duyem exlebe ji alîyê partîyên kurd yên dijberî Partîya Demokrata Kurdistanê (PDK), ku di Hikûmeta Herêma Kurdistanê (HHK) de partîya hakim e, dihêne pêş kirin. PDK serkêşîya helmeta serxwebûnê dike û palpiştî ji akademîsyen, şirovekar û rojnamegeran werdigire, ku hindek ji wan yên din bêhtir xêrxwaz in. Alîgirên vê boçûnê îdîa dikin, ku liserpêmayîna HHK, wekî herêmeka bêyî peravên deryayî, bi cîranên wê ve girêdayî dihêle, ku ew jî dê ticarî rê nedin damezrandina dewleteka kurdî. Tirsa van dewletan ew e, ku damezrandina dewleta kurdî dê bibe hokarê natenahîya kurdên ku di nav sînorên wan bixwe de niştecih in. Her bi wî teherî, komelgeha navneteweyî jî, dê piştgirîya afrandina dewleteka kurdî nekin, jiber ku ditirsin dewleta kurdî ya serbixwe dê bibe sebebê bêstiqrarîya welatên cîran ên Kurdistana Iraqê.

Birrek din ji argumentên lihember îhtîmala serxwebûnê jiber siyaseta navxweyî ya HHKê ye, nemaze rewşa aborîya bêgav, gendelîya berfreh û rêveberîyeka bêşiyan û nedemokratîk, û herwiha girêdayîbûna darayî û aborîya herêmê bi Bexdadê re. Zêdebarî vê çendê, yên gumandar bawerî bi niyazpakîya rêberayetîya PDKê nahînin û îdîa dikin, ku berpêşkirina serxwebûnê ji aliyê wê ve helmetek e jibo xalifandina bala xelkî liser tawanbarîyên gendelîyê, daku bi vî awayî bikarin dengên kurdan di hilbijartina ayinde ya ku di tîrmeha 2017an de dihête encam dan de, qazanc bikin. Hindekên din îdîa dikin ku serok Mesûd Barzanî jibo ku bikare serxwebûnê rabigihîne, ew hêz nîne û pir lawaz û bêbiryar e.

## PDKê biryara xwe daye

Yên ku liser wê bawerîyên ne ku ragihandina serxwebûna Kurdistanê tenê bi demê ve girêdayî ye, van argumentan didin pêş: Piranîya kurdên Herêma Kurdistanê piştgîrîyê li serxwebûnê dikin; rêberayetîya PDK biryara xwe jibo vê çendê daye; PDK ji niha ve zemînê jibo serxwebûnê amade dike; û, di dawîyê de, paşve zivirandina seetê di vê kêlîyê de êdî nelibar e, jiber ku alûgorên bineretî li Kurdistan û Iraqê rû dane. Herçî raya giştî ya kurdan e, ligor rapirsîneke ku vê dawîyê hat kirin, %85 kurdan piştgîrîya serxwebûnê dikin.[3] Ev piştgîrî bi demê re her ku diçe zêdetir dibe, egerê vê piştgîrîyê hem jiber traumayên ku kurdan di bin rejîmên têvel ên Iraqê de tecrube kirine, hem jî jiber rûbirûbûna bi DAIŞê re ji sala 2014an ve ye, ku canê zêdetirî 1600 pêşmergeyan qurbanî kirine. [4] Zêdebarî vê yekê, nivşên ciwan bi hizra Kurdistaneka serbixwe hatine rahînan û perwerde kirin.

Reh û rîşeyên rêberayetîya PDKê di têkoşîna bi dehan salan ya Barzanîyan de çîl vedaye; ew liser hindê ku serxwebûn bi wan ve bihête pênase kirin pêdagir in û ji hevrikên siyasî yên xwe jî bêhtir hevgir in. Herçende hindek alî trane bi armanc û motîvên wî bikin jî, serok Barzanî soz daye serxwebûnê rabigihîne, tenanet heger li gundekê Kurdistanê be. [5] Ya rastî, tenanet di nav endamên partîya opozîsyon YNKê de jî alîgirên serxwebûnê hene. Loma, Kosret Resûl, Cîgirê Serokê Herêmê, ji medyayeka îtalî re eşkere kir ku dewleta kurdî êdî tenê xewnek nîne.[6] Endamekê din yê rêberayetîyê, sekreterê duyem yê YNK, Berhem Salih ragihand, "serxwebûn mafê gelê Herêma Kurdistanê ye." [7]

Jibo pêşdebirina rojeva xwe, rêberayetîya PDK hindek gavên pratîk jî avêtine. Yek ji van hengavan mobîlîzekirina raya giştî ya kurdî ye, bo nimûne konferansek ji alîyê Zankoya Amerîkî ya Kurdistanê di dawîya çileyê pêşîn 2016 de bi merema munaqeşekirina serxwebûnê hat li dar xistin û têde bilî Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî û Serokê Ajansa Parastina Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, endamên partîyên opozîsyonê jî beşdar bûn. [8] Jibo çareserkirina qeyrana sîyasî ya ku ji salekê zêdetir e HHK şeht kiriye, PDK destpêşxerîya çend tûrên hevdîtinan bi YNK û Gorranê re daye dest pê kirin. Pêşveçûneka giring a din jî hevdîtinên îlon û çirîya 2016an yên di navbera Mesûd Barzanî û Nêçîrvan Barzanî bi Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî re bûn. Bi wê bawerîyê ku baştirîn rê jibo bidestveanîna serxwebûnê qanekirina Bexdadê ye, rojeva hevdîtinan liser binemayê palpiştîya "hevberdaneka aştîyane" hatibû dariştin, Vê dawîyê Ebadî derbirrî ku mafê kurdan yê diyarkirina çarenûsê "mafekê bêmunaqeşe" ye. [9] Di heman demê de Mesûd Barzanî çendîn caran derkeftiye tûrên paytextên cîhanê da piştgirîya dîplomatîk jibo dewleta serbixwe ya kurdî kom bike. Dûmahîkê, paralel bi helmetên jorê re hewlên reformkirina sîstema ekonomîk ya gendel jî dest pê kirine, ku birîtî ne ji programên berteskirina mesrefên hikûmetê û rêkeftinek digel kompanyaya Deloitte re, ku kompanyaya herî mezin ya xizmetên profesyonl û darayî di cîhanê de ye, hatiye vajo kirin, da çavdêrîyê liser berhemanîn, hinardekirin û dahatên petrola Herêma Kurdistanê bike.

Helbet, astengên liber rêka serxwebûna Kurdistanê her mane, lêbelê, ji niha ve komeka şengistî ya helûmercan hene, ku bi hev re dikarin serxwebûnê bikin realîte, bi wî mercî ku rêberayetîya kurd vê carê kartên xwe qenc bilîzin.

Ofra Bengio vekolera payebilind ya Navenda Moşê Dayan bo Vekolînên Rojhilata Navîn û Afrîqayê li Unîversîteya Tel Avîvê (Moshe Dayan Center for Middle Eastern and African Studies (MDC), Tel Aviv University) ye.

*[1] Jibo lîsteyeka kurt liser serxwebûnê binêre, http://ekurd.net/related-articles/independent-kurdistan-state*
*[2] K24, 7 Desember, 2016.*
*[3] K24, August 20, 2016.*
*[4] Rudaw, Desember 25, 2016.*
*[5] Hevpeyvîna nivîskarê bi kesekê nêzîkî serokî re, , 19 Desember 2016.*
*[6] Corriere Della Sera, Desember 12, 2016.*
*[7] Ekurd Daily, 15 Desember 15, 2016.*
*[8] Ekurd Daily, 15 Desember 15, 2016.*
*[9] Rudaw, August 26, 2016.*

## Kurd derketine ser nexşeya navneteweyî



Di demê de ku gelek ji van argumentan di destpêkê de qaneker dixuyin, lê ji guhertinên berfreh ku li cîhanê bi giştî û li Rojhilata Navîn bi giştî rû dane, çavpoşyê dikin; guhertinên ku renge di teşegirtina çarenivîsa Kurdistanê de diyarker bin. Di maweyê beşeka mezin ji sedsalan bîstan de, şer û pevçûnan kurd duçarî gelek malwêranîyan kirine; lêbelê, di guhêra sedsala bîst û yekê de, sê şeran asoyên nû lihember wan vekirin. Şerê Kendavê yê 1991an bingehê otonomîyeka rasteqîn li bakurê Iraqê danî; Şerê Iraqê yê 2003ê peywendîyên HHK bi DYAyê re çîmento kir û teşe da Iraqeka federal ya piştî Seddamî; û şerê lidij Dewleta Islamî (DAIŞ), ku di havîna 2014an de derket, kurd danîn ser nexşeya navneteweyî. Şerê ku vêgavê Herêm gîrodarê wê ye, belkî dergehê derfeta serxwebûna veke, jiber ku rê da Pêşmergeyî herêma Kerkûkê kontrol bike, ku HHK dikare wê di muzakereyên bi Bexdadê re bi kar bihîne, lê herwiha jiber ku HHK jibo komelgeha navneteweyî îsbat kir, ku aktorekê girîng yê di şerê dijî DAIŞê de ye.

Di hêla din de, alûgorên herêmê û şerê dijî DAIŞÊ lawazîya sê dewletên herêmî eşkere kir; Iraq, jiber dabirka Sunnî-Şîe û şerî bixwe; Tirkiye, jiber çalişên navxweyî, rewşa ekonomîk ya berbi xirabîyê û têalîyanên herêmî; û Sûriye, jiber çendîn şerên wê. Gelo heger HHK rêka serxwebûnê peyrew bike, bertekên çaverêkirî yên van dewletan, ango cîranên HHK dê çawan bin?

Dewletên cîran ji yek qumaşî pêk nehatine. Tirkiyeyê dîkotomîya kurdên "qenc" li Iraqê lihember kurdên "xirab" li Tirkiye û Sûriyê liba xwe çê kiriye. Liser vê rêbazê, mirov dikare rewşekê bisêwirînê ku têde Tirkiye bişêt bi dewleteka kurdî li Iraqê re bijî, lê di heman demê de şerê xwe dijî kurdên din bidomîne. Renge berjewendîyên stratejîk û ekonomîk ên Tirkiyê helwêsteka wisa paradoksal dîkte dike; çunkî Enqere dê jiber pêdivîya xwe bi petrol û gazê, jiber hevsengîya bi Îranê re û jiber çêbûna zona tampon lihember mihwera hîlala Şîe ya di halê frehbûnê de, dê muhtacî dewleta kurdî ya Iraqê be. Sûriye heta demeka dirêj dê lawaz bimîne, lê divêt mirov çaverêyî kêşeyan ji aktorên nedewletî be – aktorên wekî Cebhet Feth el-Şam û tenanet ji YPG (Yekîneyên Parastina Gel) – ku renge hewl bidin ji dewleta nû ya kurdî re gelemşeyan derêxin.

Herçî Bexdad e, nahê payîn ku şerekê seranserî lihember HHK rabigihîne, jiber ku di nîveka şerê dijî DAIŞê de ye, ku vê gavê jibo Bexdadê di nav herdu xiraban de ya xirabtir e. Lê dîsan jî, mîlîşyayên Şîe, ango Heşda Şeibî, ku di maweyê du salên dawîyê de bi awayekê berçav hatine bihêz kirin û ji alîyê Îranê ve hatine piştgîrî kirin, belkî biryarê bide lihember kurdan berûka şerî veke.

Wisa xuya ye, ku Îran dê lihember dewleta kurdî bibe kospa herî mezin. Çunkî berdewam dijîtîya xwe lihember çemka serxwebûnê ragihandiye, partîyên opozîsyonê, YNK û Gorranê, dijî helmeta serxwebûnê sor dike û tenanet navgînên rasterast jibo pêşgîrî ji avakirina wê bi kar dihîne. Jiber heman egerên ku Îran lidij dewleteka kurdî ye, Tirkiye jî dê piştgîrîya wê bike: dewleteka kurdê dê dewleteka sunnî be, dê nifûza Tirkiyê li herêmê bihêztir bike, û dê desthilata Şîe li Iraqê berteng bike. Pirsa giring ew e, ka gelo Îran dê şerekî dijî Kurdistana serbixwe bide destpê kirin yan na. Bersiva vê pirsê nehête zanîn jî ya ewle ew e, ku dê hewl bide wê lawaz bike; û, di rewşeka wisa de, dibe ku DYA roleka biryarder di piştgîrîya kurdan de bigêrre; ew rol jî girêdayî siyaset û pêşekîyên rêveberîya Trump e.

Gelo arîşeyên aborî çi kartêkerî hene? Rewşa berbi xirabbûnê ya aborî gelek caran wekî astenga serekî ya lihember serxwebûnê hatiye bi nav kirin. Helbet, piştî deheyek geşestandina aborî, herêm bi qeyraneka kûr ya aborî re rûbirû bûye; ev jî hem jiber hewandina du milyon penaber û kesên ji cihwarê xwe bûyî, hem jiber keftina bihayê petrolê, ku herêm bi temamî pêve girêdayî ye, hem jiber lêçûnên eskerî yên rêje-berz di şerî de, û, hem jî ji hemiyan giringtir, jiber cerenîxa bi Bexdadê re liser budce û rêkeftina dahatên petrolê. Gava ku HHK di hezîrana 2014an de Kerkûk kir bin kontrola xwe, peywendîyên wê bi Bexdadê re, ku di dawîya 2013an de budceya Kurdistanê birrîbû, gihîşt asta herî krîtîk. Hindek liser wê bawerîyê ne, heta Herêm kêşeyên xwe yên aborî çareser neke, divêt serxwebûnê ranegihîne. Yên din dibêjin tenê rêya ku herêm bikare pirsgirêkên aloz ên xwe bi Bexdadê re çareser bike serxwebûn e. Barzanî bi raşikavî ev boçûn wiha derbirriye: "Jiber ku me nekarî bi Bexdadê re partnerîyeka rasteqîn çê bikin, bila em aşiyane bibin cîranên qenc." [2]

## ENKS – PYD

# Nakokî dewam dikin




Karîkatûrîst Dijwar Îbrahîm nakokîyên PYD – ENKSê yên liser destûrê xêz kiriye. Di vê karîkatûrê de Îbrahîm pozîsyona ENKSê, PYDê û rejima Beşar Esad destnîşan kiriye.

ENKS wekî pêşniyaz jibo birêvebirina herêmên kurdan dest bi amadekirina destûrekê kiriye. Herçend ew destûr nehatibe ragihandin jî PYD dijberîya xwe liser destûra ENKSê dihîne ziman.

DERYA KILIÇ

Zilhêzên cihanî û herêmî bo çareserîya qeyrana Sûriyê danûstandinan dikin û dihêt çaverê kirin ku di hefteya dahatî de Tirkiye û Rûsya rejîma Sûriyê û opozîyona Sûriyê li paytextê Kazakîstanê li Astanayê bigîhînne hev. Li Rojavayê Kurdistanê jî nakokîyên ENKS – PYDê dîsan zêde bûne. ENKS û PYD demeka dirêj e lihev nakin û ji kiryar û siyasetên hevdu aciz in. Lê rûdanên dawî vê acizî û alozîyê kûrttir dikin. Herî dawî Encûmena Niştimanî ya Kurd ya li Sûriyê (ENKS) dest bi amadekirina destûrekê kir. ENKSê heta niha bi awayekê fermî ew destûra xwe ranegihandiye. Heta niha xal û naveroka pêşnumaya destûrea ENKSê nahêt zanîn. Lê ligor zanyarîyên ku heftenameya Basê ji çavkanîyan bi dest xistine pêşnuma ji 115 xala pêk dihêt û pisporên almanî û swîsî jî alîkarîya ENKSê dikin.

Serokê ENKSê Îbrahîm Bro û Endamê Serkirdayetîya PYDê Ebdo Sîhanok derbarê nakokîyên alîyan de bersiva pirsên Basê dan.

**Serokê ENKSê Îbrahîm Bro: Em dixwazin Sûriyê dewleteka federal be**

Serokê ENKSê Îbrahîm Bro di destpêka lêdiwana xwe de derbarê pêşnumaya destûra bingehîn de axivî û diyar kir ku ew vê reşbelekê jibo sibêroja herêma kurdî amede dikin. Ew niha ti destûrekê dernaxînin. Ew tenê dixwazin ku wekî Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê projeyeka wan hebe. Ew dixwazin Sûriyê dewleteka federal be. Jiber rewşa Sûrî û nakokîyên ku di navbera pêkhateyên Sûriyê de çê bûne, Sûriyê dewleteka federal be, dê baştir be. Herêma Kurdistana Sûriyê jî wekî herêmeka federal di nava wê de cih bigre.

Bro derbarê pêşnumayê de hin zanyarî bi heftenameya Basê re parve kirin û got: "Me ev proje bi alîkarîya hin pisporine almanî û swîsî yên warên huqûqî û civakî re çê kir. Me bingeha destûrê amede kir û aniha jî em dê serlêdana nêrînên siyasetmedar, hiqûqnas û xelkê xwe bikin ku jibo pêşxistina projeyê alîkarîya me bikin. divêt ez vê bibêjim ku ev nabe destûr; dibê proje. Jibo bibe destûr, divêt di nav milet de rapirsîn çê bibe. Heta ku rapirsîn hilbijartin çê nebe, nabe destûr. Heger pêkhateyên kurdî û dewletên navneteweyî bixwazin em dikarin nêrînên xwe yên derbarê Kurdistana Sûriyê bi wan re parve bikin."

Bro armanca projeyê jî nirxand û aşkere kir ku ew dê li derve û hundirê Sûriyê liser vê meseleyê civînan pêk bînin. Piştre ew dê ligor civîn û danûstandinan hinek guhertinan bikin. Lê divêt berê hemû endamên ENKS qebûl bikin. Heke bihêt qebûl kirin, êdî ew dikarin bibêjin jibo rêveberina Kurdistana Sûriyê projeya ENKSê heye.

Biro derbarê nerazîbûnan jî axivî û da zanîn dema ku wekî pêşnuma liser çapemenîyê belav bû (ku wan ranegihandibû) ew bi hin nerazîbûnan re rûbirû bûn û ew kes dibêjin ku sînorên Herêma Kurdistanê bi awayekê baş nehatîye zelal kirin. Hin jî dibêjin jibo çi navê Efrînê di projeyê de nehatiye dayîn. Bawerîya wan wilo ye. Lê wan Efrîn jî danîye têde. Wan seranserê sînorên herêmê heta Tirkiyê, ji Derîkê heta Efrînê Herêma kurdî diyar kirine.

**"PYD endamên me azad bike em dê pêre rûnên"**

Îbrahîm Bro Hewiha bal kişand ser nerazîbûnên PYDê yên derbarî destûrê û wiha pêde çû: "Bi Xweserîya Demokatîk re ti danûstandin û pêwendîyên me tune. Jiber ku hertim yekalî kar kirine. Ya din jî jibo projeyên kurdî qet nexebitîne. Heger di navbera me de têkilîyên siyasî û danûstandin tunebin, tenê jibo vê ti wate tune ku em civînan pêk bînin. Em dikarin herêma xwe ji alîyên siyasî, leşkerî û rêveberî ve bi rê ve bibin; em tenê projeyekê daynanin. "

Ji alîyê din vê Bro sibêroja destûrê jî nirxand û rave kir ku ew bi tena serê xwe nikarin arîşeyên Kurdistana Sûriyê çareser bikin. Ew jibo miletê kurd statuyekê dixwazin.

Bro di dawîya axaftina xwe de danûstandin û siyaseta Xweserîya Demokratîk nirxand û got: "Heta Xweserîya Demokratîk şaştîyên xwe fêm nekin û ji vê siyaseta xwe veneg-erin û endamê me bernedin, em bi wan re danûstandinan nakin. Ji alîyê din, dijî ENKS û xelkê gelekî şaştî kirine. divêt em vê qebûl bikin."

**Endamê PYDê Ebdo Sîhanok: Kiryar û gotinên ENKSê hev nagirin**

Endamê PYDê Ebdo Sîhanok nerazîbûnên PYDê yên derbarê reşnivîsa ENKSê de diyar kirin û ragihand ku ENKS bi daxunîyekê, xwe ji hemû meseleyan kişandiye. Piştî 3-4 rojan peymaneka civakî ku navê wê kirine Destûra Îqlîma Kurdistana Sûriyê derxistine. Niha herdu kiryar û gotinên ENKSê li hev nagirin. Di destpêkê de gotin: "Me tiştekê wisa çê nekiriye û karmendên me çê kirine." Li gor nêrîna min planeka din çê kirin û xwastin serê hemûkesî tevlihev bikin û projeya Federalîya Demokratîka Bakurê Sûriyê ji holê rakin. Ebdo Sîhanok bal kişand ser vexwandina ENKSê û aşkere kir ku jibo civîn û sibêroja rojavayê Kurdistanê ENKS hatibû vexwandin û ev vexwandin hîn jî berdewam e. Wan di kongreya xwe ya dawî de jî tekez kiriye ku lihevhatineka kurdî bibe esasê Xweserîya Demokratîk. Federalî sîstema sibêroja Sûriyê ye. Em bi awayekê cidî li meseleyê dinêrin; ne wekî meseleyeka propagandayî.



# Hikûmeta Herêma Kurdistanê bersiva PYDê da!



Di heftaya çûyînê de dihat gotin ku helîkopterên Tirkiyê Kantona Cizîrê bombebran dike. Piştî vê bûyerê Desteya Berevanî û Parastina Kantona Cizîrê di nava hefteyê de daxuyanîyek belav kir û di daxuyanîyê de diyar kir ku di nava 3 mehan de helîkopterên Tirkiyê ji sînorê başûrê Kurdistanê derbasî Rojavayê bûne û çend caran baregehên leşkerî yên li gundên Til Elo û derdora wê bombebaran kirine. Herwiha ew helîkopter liser sînorê başûrê Kurdistanê ve derbasî rojavayê Kurdistanê bûne.

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Sefîn Dizeyî bi daxuyanîyeka nivîskî nerazîbûna xwe nîşan da û got: "Duhî di daxuyanîyekê de bi navê Desteya Berevanî û Parastina Xweserîya Demokratîk ser bi PYDyê ku navê Kantona Cizîrê jê ra hatiye danan, Hikûmeta Herêma Kurdistanê tometbar kir û îdîa kir ku roja sêyê vê mehê çend balafirên cengî li binkeyeka serbazî ya hewayî li Herêma Kurdistanê rabûne û devera Til Elo ser bi Cizêrê bomberan kirine. Em vê yekê red dikin, ti ser û binê vê îdîayê tune, tenê cihê pêkenîn û nîşaneya asta nexweşîya nivîskarên wê ye, diyar e cemaeta bi navê Kantona Cizîrê xewn dîtine."

## Derkirina akademîsyenên Artukluyê

# KHKyê akademîsyenên kurd da ber xwe

Mamosteyên wê demê, gava em li profîla wan dinêrin, hem ji Kurdistana Iraqê, him ji ya Îranê, him ji ya Sûrî him ji ya vir him jî ji kurdên Ewrûpayê bûn û gelek kadro li zanîngehê bi cîh bûbûn û ji 2010an vir ve dest bi xebatê kiribûn.




NÛJÎN ONEN

Li Tirkiyeyê bi dirêjkirina Rewşa Der-Asayî(OHAL), ji aliyê hikumetê di 6ê Çileya 2017an di rojnameya fermî de, bi biryarnameya 3 Hukmê Qanûnî hat belav kirin. Bi van biryarnameyan 631 akadamîsyen ji kar hatin avêtin. Di nav wan de akademîsyenên kurd ku li Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê mamostetî dikirin hebûn. Dr. Mesut Keskin, Mikail Bulbul, Ramazan Alan, Ramazan Pertew, Selîm Temo, Ferhat Yilmaz jî ji wan bûn yên ji kar hatin derxistin. Ji bilî mamosteyên beşa kurdnasîyê, mamosteyên beşa felsefeyê, Yusuf Baluken û Cuma Çiçek jî ji kar hatin dûr xistin.

Di nava salekê de li Zanîngeha Artukluyê bi giştî 16 akademîsyen ji kar hatine derxistin. 5 ji wan yên beşa Kurdolojîyê ne. Berî vê rewşê jî 14 akademîsyenên din ji zanîngeha Artukluyê hatibûn derxistin. Herwiha girêbesta gelek mamosteyên kurdnasîyê yên ku ji derve hatibûn nehat dirêj kirin û mecbûr man zanîngehê bi cih bihêlin. Fişarek liser akademîsyenên Zanîngeha Artukluyê, bi taybetî yên beşa kurdolojîyê, heye. Akademîsyenên kurd, her yek di beşên xwe de şareza ne û liser çand, huner, ziman û wêjeya kurdî xebatên gelekê baş kiribûn; û diyarê ev kapasîteya berfreh liba wan bi dilê hikûmetê nebû û dewlet ji vê pêşkeftina beşa kurdolojîyê zêde geşbin nebû. Digel fişara li ser Artukluyê, di nava sê mehên dawî de navendên wekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Kurdî – DER û saziyên din ku liser kurdî xebat dikirin û tenanet bûbûn navendên perwerdeyê jî yek bi yek hatin girtin. Ev yek jî pirsa, ka “gelo kurdî dê cardin bihêt qedexe kirin“ di nav raya giştî ya kurdan de çê dike.

Di bernameya mastera bitez a beşa kurdolojîyê de ji sala akademîk a 2010 -2011 heta ya 2016-2017, 211 xwandekarên derçûne. Di bernameya mastera bêtez ya mamostetîya kurdî de jî hejmara xwandekaran di heman peryodê de 1125 bûn. Di nava 211 xwandekarên mastera bitez de 40 xwandekaran di bernameya kirmanckî, ango kurdîya zazakî de tezên xwe nivîsîne. Herwiha, 45 kes ji ji başûrê Kurdistanê bûn ku qismek ji wan soranîaxêv û bi kurdîya soranî tezên xwe nivîsîne. Ji Rojhilatê Kurdistanê jî heta niha 3 xwandekar, ji ya Sûriyê jî 2 xwandekar û ji Azerbaycanê xwandekarek hatine qebul kirin. Demekî hejmara mamosteyên beşa kurdolojîyê bûbû 40 kes lê ev du sal in roj bi roj ev hejmar bi rêyên cuda hate kêm kirin.

Akademîsyenên ku ji kar hatin derxistin Mîkail Bulbul û Ramazan Alan mamosteyên beşa Ziman û Çanda Kurdî nerazîbûna hikûmetê ji beramber kurdnasîyê ji heftenameya Bas re şirove kirin.

**Beşa kurdî bûbû navenda zanistê**

Akademîsyen, Mikail Bulbul, behsa xebatên xwe yên di derbarê kurdnasîyê de kir. Bulbul aşkere kir ku berî ku derbasî zanîngehê bibe li ser kurdî kar kiriye û bi vebûna zanîngehê re xebatên wî bi awayekê sîstematik berdewam kirine. Bulbul da zanîn wan hewl daye beşa kurdnasîya Artukluyê bikin navendeka giring û wiha pêde diçe: “15 sal e ez liser kurdî dixebitim, hind xebatên min çapkirî ji hene. Bo nimûne min kitêbek liser rêzimana kurdî çap kiriye û çendîn kitêbên min yên din ên çapkirî jî hene. Piştî ku em

Ji rojhilatê Kurdistanê heta niha 3 xwandekar û ji ya Sûriyê jî 2 xwandekar hatine qebul kirin. Ji aliyê din demekê hejmara mamosteyên beşa kurdolojîyê bûbû 40 kes, lê ev du sal in roj bi roj dihên kêm kirin.

hatin zanîngehê û li hev civiyan êdî em rêk û pêktir xebitîn, me li vir master xwand, xwandina doktorayê hîn jî berdewam dike. Hatina min ya vir bi vî awayî bû. Perspektîfa bingehîn jî me digot kesên ku dê bibin mamosteyê kurdî lazim e edebiyata kurdî ya klasîk, edebiyata kurdî ya nûjen,edebiyata kurdî ya folklorîk, rêzimana kurdî û metodolojîyê bizanibe. Ev dersên bingehîn wekî konsept me li vir dida.”

Bulbul liser rêkefta vekirina beşa kurdî vedigêrre û diyar dike, ku di sala 2010an de hikûmeta Ak Partiyê xwast wekî helmeteka siyasî di mesela kurdan de gavan biavêje. Di vê çerçoveyê de Enstîtuya Zimanê Zindî vekir. Helbet wê demê wekî Enstîtuya Kurdolojî muraciet hat kirin lê navê kurdolojî nehat qebul kirin. Piştî ku enstîtu ava bû di nava enstîtuyê de sê beş têde vebûn; yek beşa kurdî, yek ya sûryanî yek jî erebî bû. Di beşa kurdî de du bername hene, ku her du jî di astê masterê de ne. Herwiha kurdî wekî dersa hilbijartî jî li fakulteyên din dihête wane dan. Di wan fakulteyan de heftiyê 2 seetan dersa kurdî werdigirin.”



### Zanîngeha Artukluyê bêdeng e

Akademîsyen û nivîskar Ramazan Alan, ku ji zanîngehê hatiye derkirin diyar dike ku ew hêj nizane bê ka jiber çi sedeman ew ji kar hatine derxistin û zanîngehê ne berî derxistina wan ne jî piştî derxistina wan ji wan re ti tişt negotiye û wiha domand:“Hîn jî yek ji me nizane ka ji ber çi em ji kar hatin avêtin. Ez bi xwe jî nizanim ka ligor kîjan lêpirsînê an jî sûcdarîyê ye. Halê hazir rewşeka awarte heye û hînbûna van tiştan zehmettir bûye. Tenê me dît ku di nav lîsteya biryarnameyê de navê me jî heye em ji kar hatine avêtin, derbarê vê yekê de zanîngehê jî ti agahî nedaye me; ne berî wê ne jî piştî wê. Ez bixwe xwedîyê ti agahiyekê nînim ka ji ber çi ye?”

Nivîskar Alan, derbarê beşa kurdnasîyê de behsa metirsîyan jî dike û wiha dibêje: “Ez ditirsim ku ev rewşa xirab berdewam be, îro sibe çend biryarnameyên din derkevin û dîsa ji kurdolojîyê û ji beşên din akademîsyen ji kar bihên avêtin, wê demê bingehê zanistî yê zanîngehê dê bikeve tengasîyê. Sala dawîn xebatên wê dihatin asteng kirin. Salê me 4 -5 çalakî lidar dixist, me sempozyûm semîner,konferans amade dikirin; salên dawîn rêje gelek kêm bû heta hat gihîşt astê tunebûnê. Jixwe zeîfxistin hebû û qîmetdayinek nemabû. Eger rewş wiha bidome dê xebatên kurdolojîyê bikevin tengasîyê.”



### Artuklu temsiliyeta kurdî dikir

Di beşeka din a axaftina xwe de nivîskar Bulbul dide zanîn ku wan digel hikûmetê protokolek jî vajo kiribû û ligora wê protokolê wan bi hezaran mamosteyên kurdî gihandine û ji herçar parçeyên Kurdistanê xwandakarên bernameya masterê wergirtine, lê jiber hin fişarên hikûmetê ew bernameyên wan cih be cih nebûne û mamosteyên ku wan gihandine jî dest bi kar nekirine. Bulbul, wê proseyê wiha rave dike: “Wê demê ji wezaretê, musteşar û burokrat hatin gotin, “em dixwazin di mesela kurdî de gavekê biavêjin û bi hezaran mamoste ji me re lazim in.” Wê demê ji me re wisa hat gotin. Di wê çarçoveyê de de protokolek di navbera beşa me û wezaretê de çêbû. Liser vê protokolê mastera bêtez bo mamostetîya kurdî hat vekirin û hema ji wê demê re bû beşa herî aktîf. Ji wê beşê heta niha 1500 derçûyîyên me çê bûne. Ji mastera bitez heta niha nêzîkî 200 kes mezû bûne. Ji wan beşek ne kurmancîaxêv in û ji perçeyên din ên Kurdistanê xwandekar hatine li vir qedandine. Ev jî giring e, helbet. Ji Kurdistana Iraqê ji Silêmaniye, Germiyan, Duhok û Zaxo bigire zêdetirî 40 xwandekar heta niha hatin wergirtin. Ji Kurdistana Îranê jî 2-3 kes hatine û tenanet yek jî ji Kurdistana Sor ji Qafqazyayê hat wergirtin û hemî mezûn bûne. Bi awayekê sembolîk be di hêla dîrokî de maneya wê hebû; cara ewil piştî 80 sal qedexeya ser kurdî, temsîliyeta zimanê kurdî di astekê bilind û akademîk de bi vî awayî hat kirin.”

Bulbul, behsa akademîsyenên beşa kurdnasîyê jî dike û eşkere dike ku ji herçar parçeyên Kurdistanê akademîsyenên kurd bo xema kurdî li hev kom bibûn lê jiber mobîng û fişarê ew hewaya afrînerîyê nema û wiha pêde diçe: “Mamosteyên wê demê, gava em li profîla wan dinêrin, hem ji Kurdistana Iraqê, him ji ya Îranê, him ji ya Sûrî him ji ya vir him jî ji kurdên Ewrûpayê bûn û gelek kadro li zanîngehê bi cîh bûbûn û ji 2010an vir ve dest bi xebatê kiribûn. Nêzîkî 40 mamoste bi profîleka bilind li vir kom bûn û tevî profîla xwandekaran hêvî çê bû. Kadroyê gîhişt 40 kesî hem profîla mamosteyan û ya xwandekaran bû cîhê hêvîyê. Kurdî 80 salî hat qedexe kirin û piştre rê li ber vebû û ev realîte jibo gelek kesan wekî xewnekê bû. Jibo mastera bitez carna 400-500 kesî muracaat dikir.”



### Rewşa siyasî tesîrê li kurdî jî dike

Nivîskarê kurd Bulbul liser derxistina xwe ya ji kar jî ji Basê re wiha diaxive: “Pêvajoyên siyasî hene,konjokturên siyasî hene, van 2-3 salên dawî bi awayekê konjekturî di mesela kurd de bi awayekê xirab hinek tiştên nû çêbûn; ev helwesta hember jî perçeyek ji vê konjektûrê ye. Meseleyek makro ye ne meseleyek e ku şexsê me elaqar bike. Gava rewşa kurdan û kurdî baş dibe û têkîlîyên wan û desthilatê liser hinek bingehan xurt dibe rê liber kurdî jî vedibe. Lê gava ku şer û pevçûn hebe tiştên bingehîn, ku çê bûne dihêne hilweşandin. Li vir şerekî dest pê kir û gelek akademîsyenan jibo kutakirina şerî di bin danezanekê de vajo kirin, loma ez dixwazim vê bibêjim ku piranîya mamosteyên ku hatin derxistin di bin wê danezana akademîk de vajo kiribûn; ez jî yek ji wan im. Ew însiyatîf jibo şer bisekine û bi muzakereyan ev mesela bi riya aştiyane safî bibe ji aliyê akademîsyenên tirk ve hatibû dest pê kirin. Sê demê me jî îmze kir û ez ne poşman im, baş bû ku me îmze kir. Aqilekê desthilatê heye wisa difikirin ku nasyonalîzma kurdî gîhiştibû astekê bilind; li Kurdistana Iraqê kurd ber bi dewletbûnê ve diçûn, ev tişt dîsa li Kurdistana Sûrî jî ber bi wê arasteyê ve diçe, kurd kêm zêde bûne xwedî statuyek fîîlî. Vê yekê hinek nigeranî liba desthilatê çêkir.” Bulbul balê dikşîne ser wê çendê jî ku xwandakarê wan dê mexdûr bibin, lewre dersên wan ên spesîfîk hebûn anha xwandekar wan dersan dê wernegirin. Bo nimûne waneyên sentaks û morfolojîyê wî dida niha kes tune ye wan waneyan ji xwandekaran re bêje.

## Pêwîstî bi hişmendî, stratejî û yekgirtineka kurdistanî heye

# Serokê Gıştî yê Pakê Mustafa Özçelık

Îro serxwebûna başûrê Kurdistanê îhtîmala herî nêzîk e û dê serxwebûna wê bibe destpêka azadîya hersê perçeyên din yên Kurdistanê jî. Divêt piştgirîya serxwebûna Kurdistanê wezîfeyeka neteweyî ya hemû partîyên kurdan be.



Du sed sal in ku têkoşîna jibo azadîya miletê kurd berdewam e. Lê em dibînin, sê sebebên esasî ku heta îro rê liber serkeftin û azadîya miletê kurd girtine ev in; yekem: helûmercên navneteweyî, siyaset û ber-jewendîyên dewletên mezin; rikberîya di navbeyna bloka ku di pêşkêşîya Amerîkayê û ya di pêşkêşîya Sovyetê de. Duwem: Tunebûna hişmendî, tifaq û stratejîyeka neteweyî ya kurdan. Sêyem: Dema ku helûmercên navneteweyî misaîd bû, kurd ne amade bûn; lê dema kurd amade bûn, şert û berjewendîyên dewletên mezin rê nedida serkeftinê.

Bi firsendên ku rûxandina Sovyetê û ya sîstema du blokî derxistin holê, bi xêra çavnebarî û bêaqilîya Seddam Hûsên û bi hebûna tifaqa kurdan ya bi navê "Bereya Kurdistanî", ev qedera miletê kurd hate gu-hertin û li başûrê Kurdistanê rêya dewleta federe vebû. Niha jî serxwebûn li ber derî ye.

Başûrê Kurdistanê nêzîkî serxwebûnê ye

Ger em di dema avabûnê de îmkanên aborî, eskerî û îdarî yên neh-deh dewletên ereban, yên gelek dewletên Efrîka û Asyayê bidine ber çavan; emê bêjin ne dewletek, muxtarîyeta gundekî jî bi wan nedihate ava kirin. Heger em ligor hêza aborî, eskerî û îdarî ya Seddam Hûsên li dewletan binerin; em dê bêjin ne mimkun e ku dewleteka weha birûxe. Aşkere ye ku di avakirina dewletan jî, di rûxandina wan de jî piştgirî, alîkarî û midaxaleyên dewletên mezin roleka esasî dilihîze.

Başûrê Kurdistanê digel gelek astengî, pirsgirêk û kêmahîyên navxweyî, mercên derekî û qeyrana aborî , ablûkaya Bexdayê û bi şerê li dijî DAIŞê jî, îspat kiriye ku 26 sal e, dikare xwe bixwe îdare bike. Heger dewle-teka serbixwe be, dê hêza wê di her warî de bi dehan caran mestir û zêdetir be. Dewleteka serbixwe, dê sîstema îdarî, aborî, eskerî û îstixbaratî jî bi hişmendîyeka nû bihûne. Wê gavê ev pirsgirêkên jiber du îdaretîya Hewlêrê û Silêmanîyê dê nebe pirsgirêkeka esasî.

Piştî berxwedan û têkoşîneka bi xwîn a bi deh hezaran şe-hîdan, piştî Enfal û Helebçeyê; mihendîsên dewleta federe ya başûrê Kurdistanê, digel piştgirîya Amerîka û welatên Ewropayê, ti-faqa stratejîk ya PDK û YNKê û bi taybetî jî yekgirtina rêzdaran Kak Mesûd û Mam Celal bû.

Jiber rewşa tenduristî ya Mam Celal, niha barekê dîrokî liser milên rêzdar Mesûd Barzanî, rêveberên YNK û PDKê û yên Parlamentoya Kurdistanê ye. Herdu partî divêt jibo serxwebûnê tifaqeka stratejîk pêk bînin; parlamentoya Kurdistanê jî ligorî vê tifaqê îradeya xwe nîşan bide, Bexda jî, jibo serxwebûna Kurdis-tanê hîna hêsantir dê xwe bide ber rêya çareserîya aştiyane.

Di meşa serxwebûna başûrê Kurdistanê de, helwêst û siyaseta PKKê roleka êrênî naleyîze. Şerê ku îro PKK li bakurê Kurdistanê dimeşîne, hem zirarê dide doza azadîya Bakur, hem jî dide ya Başûr û rojavayê Kurdis-tanê. PKK digel pêwîstîya bakurê Kurdis-tanê, herweha jibo bêhnvedan û xurtkirina meşa serxwebûna başûrê Kurdistanê jî, jibo berjew-endîyên rojavayê Kurdistanê jî divêt li Bakur şer rawestîne. Divêt ji dewleta Tirkiyê û ji xêrnexwazên din, hincetên serêşînê bo Başûr peyda nekin. Divêt li Şengalê û li cîhên din yên başûrê Kurdistanê ji Hikûmeta Kurdistanê re pirs-girêkan çê neke.

Îro dewletek bi navê ''Iraq''ê ne-maye. Êdî serxwebûn ne bes dax-wazeka siyasî; herweha pêwîstîyek e ku dahatîya miletê me tayîn bike. Belê îro digel Serokê Herêma Kurdistanê Rêzdar Mesûd Barzanî divêt PDK, YNK, Goran, Yekgirtû, Komeleya Îslamî û hemû partîyên başûrê Kurdistanê jî bi awayekê zelal jibo serx-webûnê nexşerê û demekê ku neyê paşdexistin, dîyar bikin.

**Tirkiyê dê di siyaseta xwe ya liser dijayetîya miletê kurd de bisernekeve**

Destkeftên başûr û rojavayê Kurdistanê, digel destkeft û pêşkeftinên siyasî û sivîl yên li bakurê Kurdistanê, temamê plan û stratejî û hişmendîya dewleta Tir-kiye têk bir û bû sebeb ku Tirkiye wekî dewlet nexşerêyeka nû bide ber xwe. Şerê îro li bakurê Kurdis-tanê didome, dagirkirina Tirkiyê ya li Cerablûsê û peywendîyên nû yên digel Rûsya û Îranê her encama vê hêçbûn û têkçûna hişmendîya dewleta Tirkiyê ye.

Tirkiye weha hesab dike ku dê bi vê siyasetê nehêle Kobanî û Efrîn axa rojavayê Kurdistanê bibe yek û li Rojhilatê Kurdistanê dê rê liber statûyeka siyasî ya kurdan bigire. Gava Serokkomarê Tirkiyê digot; "Em dê nehêlin ew xeletîya ku li bakurê Iraqê çêbûye, li bakurê Sûrîyê dubare bibe" behsa vê hişmendîya stratejîk dikir.

Meşa serxwebûna başûrê Kurdistanê û pêşkeftinên rojavayê Kurdistanê jî vejîna neteweyî li Bakur geştir kir. Xof û tirseka mezin dewleta Tirkiyê girt. Îro ew siyaseta şerî, ya dijî kurdan, her encamê vê tirs û xofê ye. Dewleta Tirkiyê 93 sal e naxwaze fêhm bike ku ev mesele ne meseleya terorê û paşdemayîna rewşa aborîyê ye; meseleyeka siyasî û neteweyî ye û bi kuştin û wêrankirin û tune-hesibandina miletê kurd çareser nabe.

> Jiber rewşa tenduristî ya Mam Celal, niha barekê dîrokî liser milên rêzdar Mesûd Barzanî, rêveberên YNK û PDKê û yê Par-lamentoya Kurdistanê ye. Herdu partî divêt jibo serxwebûnê tifaqe-ka stratejîk pêk bînin; parlamentoya Kurdis-tanê jî ligorî vê tifaqê îradeya xwe nîşan bide Pêwîstî bi hişmendî, stratejî û yekgirtineka kurdistanî heye

HDP, DBP, DTK, KJA, hevsero-kên şaredarîyan li Amedê kon-feransek lidar xistin. Di encama vê konferansê de li cîhê ku bêjin "Jiber ku me nikarîbû rê liber si-yaseta xendek û barikatan bigirin, em bi awayekê aktîf him-berî şerî derneketin, em jî gelê xwe uzrê dixwazin"; bileksê vê, piştgirîya xwe ji wê siyaseta xendek û barikat û şerî re nîşan dan.

Îro li alîyekî şer û rewşa awarte berdewam e; li alîyekî jî AKP bi guhertina destûrê dixwaze ''sîstema serokatîyê'' bîne. Sîste-ma serokatîyê, digel vê destûra nîjadperest û dijî demokrasîyê, dijî miletê kurd, dê bi îdareya takekesî totalîterîyê xurtir bike. Tirkiye heta ku şerî ranewestîne û rêya ça-reserîya siyasî digel hemû partîyên bakurê Kurdistanê veneke, dê nikaribe ti pirsgirêkên xwe çareser bike.

**Qedera her çar perçeyên Kurdis-tanê bi hevdu ve girêdayî ye**

Di dîroka Kurdistanê de, di ti demê de wekî vê demê, qedera kurdên herçar perçeyan di vê astê de bi hevdu ve nehatîye girêdan.

Ev rastîya di afrandina siyaset û stratejîya partîyên her perçeyekê Kurdistanê de jî, guhertineka esasî bi xwe re tîne.

Êdî tehemula miletê me tune ye ku partîyên siyasî yên kurdan bo berjewendîyên xwe armancên neteweyî yên miletê kurd piştguh bikin. Îro serxwebûna başûrê Kurdistanê îhtîmala herî nêzîk e û dê serxwebûna wê bibe dest-pêka azadîya hersê perçeyên din yên Kurdistanê jî. Divêt piştgirîya serxwebûna Kurdistanê wezîfeyeka neteweyî ya hemû partîyên kurdan be.

Li rojavayê Kurdistanê , pêkanî-na Mitabiqetên Hewlêr û Duhokê zerûrî ye, pêwîstiyeka neteweyî ye. Benda herî mezin ya hemberî hemû plan û stratejîyên xêrnex-wazên miletê kurd, bi yekgirtina navxweyî û bi hişmendîyeka neteweyî dikare bihêt ava kirin. Îdareyeka hevbeş dê qedera gelê me tayîn bike.

Îro li rojavayê Kurdistanê Mi-tabiqetên Hewlêr û Duhokê pêk nayên, endamên ENKSê têne gir-tin.Li Şengalê îdareya Hikûmeta Kurdistanê nayê qebûl kirin. Li ba-kurê Kurdistanê PKK ti partîyên kurdan nahesibîne û şerî kûrtir dike. PKK bi giştî, hişmendîyeka kurdistanî, neteweyî, stratejîya dewletbûnê, çi binavê ''taktîkê'', çi bi helwêsteka siyasî red dike.

## Perçeyê biçûk, lê derîyekê mezin yê dewletbûnê: Rojavayê Kurdistanê



Siyaseta Obama ya ku di destpêkê de himberî Esad meşand hêvîyeka wha çêkiribû ku rejîma Esad dê heta 6 mehan birûxe. ENKSê jî temamê plan û stratejîya xwe ligorî vê hêvîyê danîn. Lê Obama jî carekê ve siyaseta xwe guhert û hedefa xwe ya rûxandina Esad sist kir.

Vê siyaseta nû ya Emerîkayê tesîreka negatîf hem liser stratejî û planên rêzdar Mesûd Barzanî, hem jî liser yê ENKSê kir. Piştî ku Obama dest ji rûxandina rejîma Esad berda, PYDê jî peywendîyên xwe yên digel rejîmê xurtir kir û Mitabiqeta Hewlêrê hiç hesiband. PYDê got; "Em nahêlin ti hêzeka eskerî bêyî îradeya me der-bas bibe. Her hêzeka eskerî divêt di bin fermandarîya YPGê de be." Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Bar-zanî jî bi hesasîyeta ku "şerê bira-kujî" rû nede, nebû alîgirê derbasbûna Pêşmergeyên Roj bo rojavayê Kur-distanê.

Di vê navbeynê de PYDê digel hinek alîyên ereban "Federasyona Rojava-Ba-kurê Sûrîyê" îlan kir. Tiştê balkêş ew bû ku ji destpêkê ve, PYDê bi ti awayî behsa "Kurdistan"ekê nedikir. Piştî demekê navê "Rojava" jî ji vê federasyonê hate derxistin.

Niha jî PYD tenê bi rênedana Pêşmergeyên ENKSê qayil nabe; êdî rê liber xe-batên siyasî yên ENKSê jî digire û rêveber û endamên wan digire.

Statuyeka siyasî ya li Roja-vayê Kurdistanê dê rêya yek-kirina fîlî ya Başûr û rojavayê Kurdistanê hêsantir bike. Ger bi statuyekê rojavayê Kurd-istanê bigihêje Behra Spî, dê rê ji wê yekê re vebe ku petrol û xaza tebiî ya başûrê Kurdistanê yekser bi rêya Behra Spî bigihêje cîhanê. Ev dê jibo serxwebûn û dewlet-bûna başûrê Kurdistanê jî, jibo pêşdebirin û xurtkirina statuya rojavayê Kurdistanê jî û jibo rêlêvebûna azadîya herdu perçeyên Kurdistanê yên din jî dê bibe şoreşek.

Tirs û xofeka ku ketiye dilê dewleta Tirkiyê jî ev rastîya ye. Tirkiye jibo hinartina petrol û xaza tebiî ya başûrê Kurdistanê niha yekane derî ye. Heger Tirkiye by-pass bibe û kurd yekser, liser roja-vayê Kurdistanê berhe-mên xwe bihinêrin derve, dê rola Tirkiyê ya liser Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî kêmtir bibe û Tirkiye dê ji alîyê aborî ve jî zirarê bibîne. Herwiha dê rêya dewletbûna kurdan hêsantir bibe.



## Rejîma Îranê bi bêdengîya cîhanê dix-waze doza azadîya miletê kurd bifetisîne

Îran bi xêra siyaseta Obama, li ser navê şiîtîyê, bû wekî împaratorîyeteke. Herî dawî jî protokola nukleerî ya Îran û welatên 5+1 ji Îranê re bû derî û nefeseka nû ku împaratorîyeta xwe xurtir bike.

Îranê di vê demê de, îdam û kuştin û zext û neheqîyên himberî miletê kurd jî zêdetir kir.Partîyên Rojhilatê Kurd-istanê, jibo ku zerar negihêje başûrê Kurdistanê, jibo ku Îran ji xwe re neke hincetê êrîşan, di van çend salên dawî de şerê çekdarî rawe-standine.Bêdengîya Amerîka û dewletên Ewropayê û rawestandina şerê çekdarî ji alîyên partîyên rojhilatê Kurdistanê ve, rejîma Îranê bêminetir kir; Îranê êrîşên xwe yên dijî doza azadîya Kurdistanê zêdetir kir.

Piştî bêdengîyeka dûr û dirêj, PDK Îranê, Kome-leya Zehmetkêşan û hinek partîyên din yên Rojhilatê Kurdis-tanê, careka din biryara destpêkirina şerê çekdarî dan û Pêşmergeyên xwe derbasî rojhilatê Kurd-istanê kirin. Helwêsta Îranê, partîyên kurdan mecbûrî vî şerî dike. Jibo mafên netew-eyî yên demokratîk yên kur-dan, ji alîyê dewleta Îranê ti gav nayên avêtin; hemû rêyên xebata siyasî, sivîl, demokratîk hatine girtin.

Donald Trump mesajên tund li himberî Îranê dide û nerazîbûna xwe dijî xurtbûn siyaseta Îranê tîne ziman. Ger Trump gorî van gotinên xwe siyasetê bimeşîne, dê tesîreka pozîtîf liser doza azadîya rojhilatê Kurdista-nê jî bike. Îran çiqasî lawaz be, pêwendîyên wê yên navneteweyî çiqasî xera bibe û cih lê teng bibe; dê rêya azadîya miletê kurd hem li Îranê û hem jî li perçeyên din xweştir be.

# Îmaja kurdan di dîroknigarîya dewletgerane de II

# Mînaka Simko

KAMAL SOLEIMANI

Simko, piştî ku brayê wî yê mezin Cefer Axa ji alîyê hakimê Tewrêzê Nizam el-Seltene, bi destûra welîehdê Qecer di sala 1905an de hat kuştin, wekî serekê hoza Şikak hat hilbijartin.1

Cefer Axa bi peywendîyên xwe yên bi hêzên Alayê Hemîdîye li herêma kurdî di Dewleta Osmanî re hatibû nasîn. Gava ku mirov beşdarîya Alayê Hemîdîye di çalakîyên siyasî yên kurdan di deheyên pişt re bide ber çavan, peywendîyên wî teherî dikare girîgîyek dîrokî ya mezin liser hişmendîya etno-neteweyî ya kurdan hebûbe. Gav ku brayê Simkoyî mir, ew di jîyê 20î de bû, lê bi rexma hindê ew wekî serekê hoza Şikak hat hilbijartin, ku di hêla mezinahîyê de duyemîn hoza kurd li Îranê bû.2 Di sala 1912an de, ango heft salan piştî hilbijartina wî wekî serekhoz, Simko bo Rûsyayê hat vexwandin. Li Tiflîsê, jibo rêzgirtinê, ew ji alîyê hakimê wir bi rêwûresmeka hêzên swarî ve hat pêşwazî kirin.3 Sala bi dû re, Simko bi alîkarî û rênimênîya Ebdurrezaq Bedirxan, li bajarê Makûyê yekemîn xwandegeha kurdî damezrand.4 Salekê piştî wê, Bedirxan û Simkoyî hewl dan xwandegeheka din li bajarê Xwoyê vekin, lê mixabin karbidestên îranî rê nedanê.5 Ev salên destpêkî jibo ayindeya siyaseta etnîk a Simkoyî dikare çaresaz be, di heman demê de hizra tolhildana kuştina brayê wî jêre bûbû hesretek. Di heman demê de, Simko bi cindîyekê herî zana yê kurd, Bedirxan re dixebitî, ku di wê serdemê de ji hemî rêberên nasyonalîst yên kurd bi azmûntir û bi şiyantir bû. Hêjayî amajekirinê ye, ku Ebdurrezaq Bedirxan yek ji şagirtên herî mumtaz yên şairê modernîst ê kurd yê sedsala 19an Hacî Qadirê Koyî bû. Liser daxwaza Ebdurrezaq Bedirxan bû ku cîgirê konsulê rûs Çîrkov li Urmiyê palpiştîya vekirina yekemîn xwandegeha kurdî li Makûyê di 27ê çiriya pêşîn 1913an de kir. Simko 29 zarok ji jîyê heşt heta dehan kom kir û 40 ji peyayên xwe jibo zêrevanîya xwandegehê erkdar kir.6 Simkoyî herwiha şexsen nameyek ji tzarê rûs re şand.7 Wisa xuya ye, Bedirxan jî herwekî gelek entelektuelên nasyonalîst ên hevçerx yên hevtevna osmanî û qacar, ji kultura rûsî re awayekê tehsîn û teelluq di hizr xwe de perwerandibû. Ji lewre alîgirê hindê bû ku kurdî bi alfabeya kirîlîk bihêt nivîsîn. Ev yek nîşan dide, ku Bedirxan ji hişmendîya nasyonalîst û entelektuel di nav fars û tirkan de agehdar bû. Van entelektuelan piştîgîrîya reformên alfabetîk û lenguîstîk dikirin; reformên ku ligor wan dikarîbû xwandewarîyê zêde bike û karîgerîya `dîtirên` wan (tirk, fars) ku bi zimanên neteweyî yê wan ve girêdayî bû, ji nav bibe. Wisa xuya ye, ku Bedirxan kultura rûsî ji yên ereb û farsan kêmtir wekî gef hilsengandiye. Ji lewre, wî bi merema amadekirina kirîlîzekirina alfabeya kurdî, ji akademîsyenên rûs alîkarî xwast. 8 Bi heman teherî wî hem daxwaza çapkirina rojnameyeka kurdî kir hem jî daxwaza damezrandina etudên kurdî li Saint Petersburgê.9





Bedirxan siyasetmedarekê berceste yê terîtuarxwaz bû. Belkî di wê serdemê de bilî wî ti rêberekê din yê kurd yekgirtina axa Kurdistanê hindî wî nekiribû rojeva xwe. Yek ji stûnên stratejîya Bedirxanî ew bû ku “welatê kurdan paşve bizivirîne û azad bike, bêyî ku dest dayne ser erdê îranî û tirkan.” 10 Bêguman, zaniyarîyeka berfreh liser sînorên niştîmanê wî yê sêwirandî li ber destan nîne. Ne jî ti krîterên pênasekirî hebûn, ku xelk bi wan herêmên kurdî û nekurdî, bi temamî yan parçeyî destnîşan bike. Jiber vê çendê, arîşeya diyarkirina sînorên terîtuaran jibo kurdan hat reha kirin, ku ew pirsa sînorên cografyaya sêwirandî ya xwe bi xwe destnîşan bikin. Meyla Simkoyî liser planên bi îddîa yên Bedirxanî jibo serxwebûna Kurdistanê hebû. Heta ku ixtilafên wan liser ajandaya Rûsyayê ew ji hev dûr kirin, Simko alîgirê bi hewes yê Bedirxanî bû. Yekîtîya kêm-temen a wan dema ku Bedirxan xwast Komeleya Civakî ya nûdamezrayî hemberî Osmanî bike partîyeka siyasî ya alîgirê Tzar, gihîşte dawîyê. 11 Hawar îdîa dike, dema ku Simko jibo xwandegehê zekat kom dikir, Bedirxanî hewl da kurdan lihember osmanîyan pirçek bike. Di vê qonaxê de Simko bi vê argumentê lidij rawestîya ku, di şûna kuştina çend eskerên osmanî de, ku ne di berjewendîyên kurdan de ye, divêt pereyên ku dihên kom kirin jibo xwandegeh û helmetên perwerdeyî bihên mezaxtin.12 Ev argument ne tenê jîrtîya Simkoyî diselmîne, herwiha bihayê ku wî dida helmetên kulturî û perwerdeyî radixe ber çavan. Lê, dijwarîya herî mezin di peywendî bi van helmetên kulturî re “parastina wan lihember komployên karmendên ecem bû, ku kurd ji rûsan piçekî qenctir didîtin. Lîderên dînî, alîgirên ecem û pro-osmanî jî di nav de, dest bi ajîtasyonê lidij xwandegehê kiribûn û şayie belav dikirn, ku gûya Simko bi vekirina li ber e ku zarokan bibe ser dînê fileyan.”13 Dost û dijminên Simkoyî ji zeka û behremendîya wî haydar bûn. 14 Muhemmed Temeddun, tirkekê azerî, ku endamê Komîsyona Cengê ya Urmiyê lidij Simko bû, dinivîse ku di nav kurd û asûrîyên herêmê de Simko “kesê herî munewer” e. 15. Zêdebarî vê vegêrranê, Simko tevî çendîn şêwezarên kurdî, zimanên tirkîya azerî, farsî û rûsî jî dizanî. 16 Wî serinceka taybet dida zimanê kurdî û kurdî kire zimanê fermî yê herêma bin desthilata xwe. 17 Helmetên wî jibo dewleta Qacar serêşîyeka mezin çê kiribû. Serokê bîroya bacgîrîyê li Tewrêzê huşdarî dabû, her awayekê belgeyan bi kurdî îlegal û neqanûnî ye û yên ku wan belgeyan bi kar bihîne dê rastî aqûbet û encamên dijwar bihên. 18 Balkêş e, ku Simkoyî entreseyeka berceste jibo hunerên bedew hebû. Bo nimûne, di mala wî de piyano hebû, 19 xuya ye, di dema surguna xwe li Rûsyayê hînî jenîna piyanoyê bûbû. 20 Temeddun vedigêrre ku Simkoyî li welatên dereke xweş derbas kiribû, û ji lewre bi çavekê qedirdanînê li tiyatro û sînemayê dinêrî. 21 Lê Kesrewî, dîroknigarekê navdar yê pro-Riza Xan, tiranê xwe bi Simkoyê `nexwande` dike, ku bi ser de doza serxwebûna kurdan dike. 22 Lê, ne Kesrewî ne jî dijminên wî, nasyonalîzma serwer, ango Riza Xan, dikine bin pirsenîşanê, bi rexma vê ketwarê ku, Riza Xan jî, “ti perwerdeyeka fermî ya rêkûpêk nebû û îmla û rastnivîsîna wî bûbû mijara tiraneyên gelek anekdotan.”23



## Simko û nakokîyên kommunal

Di dema CCI de, Simko û peyrewên wî bi hemet bûn û ji tevlîbûna di şerî de hezer dikirin. Bi rexma vê çendê, dijminatîyên etnîk-dînî gihîştin radeyekê ku, di bin ”guvaşa hîsteryaya şerî de, krîstiyanên Urmiyê hemîyan şer wekî nakokî di navbera osmanîyên misilman û rûsên krîstiyan de hilsengandin.”24







Van pêşveçûnên nû hinekê din agirê heyî gurr kir. “Di maweyê şerî de … Rûsyayê şerekê qirkirinê li Rojhilatê Anatolyayê da dest pê kirin û derûdora heştê ji sedî 25 ji şênîyên kurd li wir qir kir.”26 Dijminatîya dewletan û hêzên mezin ziyaneka mezin gehane komelgehên herêmê ku li nêzîkî navçeyên şerî niştecih bû, evca çi di şerî de beşdar bûbûna çi nebûna. Dawîya deheyên sedsala 19an, herêma Gola Urmiyê jixwe bûbû meydana milmilanê. Hizra xwe-rêvebirinê di nav komelgehên dînî û etnîk de herku diçû populer dibû. Di maweyê CCI û bi pey re, hejmareka mezin ji krîstîyanan ji cih û warên xwe hatin rakirin û li hin cihina hatin niştecih kirin, ku xelkê xwemalî yên wir ne dixwastin ne jî dikarîn wan xwedî bikin. Nêzîkî “50,000 asûrî ji Hekarîyê (Cîlu, bi rêbertîya Mar Şîmon) û ermenîyên Wanê wekî penaber li deştên Urmiyê peya bûn. Jiber serpêhatîyên şerî, ev penaber bêreje feqîr û antî-misilman bûn.”27 Xiyaba hêza dewletê herêm avête ber rehma rikeberîyên komelgehî û serîhildana hevalbendîyên nû ligor xêzên dînî.28 Hem Simko û hem jî dewleta qacar ermenî wekî gef dinirxandin; di heman demê de kurd û asûrî jî liser Urmiyê ketibûn milmilanê. 29 Tomarên brîtanî radigihînin ku “hem Simkoyî hem jî ruhê tevgerane yê dewleta embrîyonîk a ermenî temaya deştên bi adan yên Urmiyê dikirin.”30 Hebûna dewleta qacar li herêmê tenê bi nav bû. Loma, gava ku “kela Simkoyî … hate fetih kirin, gelek dokumentên cuda ketin dest. Gelek name ji karbidestên îranî di nav wan de hatin dîtin … ku jibo Simkoyî hatibûn şandin û jê hatibû xwastin ku lihember krîstîyanan serî hilde.” 31

*Jêrenot*

*1.Binêre Temeddun, 334–35.*

*2.Tomarên Wezareta Derve di Mujtaba Barazuyi de. Lêkolînek liser Rewşa Siyasî ya Kurdistanê; 1889-1946 [Barrasī-e Awżā-e Siyāsī-e Kordestān; az sāl-e 1258–1325], (Tehran: Fekr-e No. 1999), 150.*

*3.Bb. Robert Olson, The Rise of Kurdish Nationalism about the role of Hamidiye in the Kurdish nationalism, 1880–1925 (Austin: University of Texas Press, 1989).*

*4.Muhammad Resul Hawar. Simko; Ismail Aghay Shikak u Bizutnewey Netewayeti Kurd (Stockholm: Çapxaney APEC, 1995), 259–264.*

*5.Hwb., 150.*

*6.Hwb.*

*7.Hwb.*

*8.Binêre Celili Celil. Kurdish Cultural and Political Movement in the late 19th and early 20th Century. Werger. Naazi Fard. (Beirut: Dar al-Kitab, 1986), 178–181.*

*9.Hwb.*

*10.Binêre Michael Anthony Reynolds. The Ottoman-Russian Struggle of Anatolia and the Caucasus, 1908–1918, (Unpublished PhD Dissertation. UMI Number: 3107877. 2003), 118–23.*

*11.Eden Naby di vekolîna xwe ya bi sernavê “The First Kurdish Periodical In Iran,” bêyî ku amajeyî Simkoyî bike, dibêje Bedirxanî di sala 1912 de rojnameyek weşand. (http://www.aina.org/reports/fkpir.htm). Ti şopên rojnameya kurdî ya sala 1912an de hatine dîtin. Gava ku behsa Turjani û Turjanizadeh jî dike, Naby navê Simkoyî jî nahîne, tenanet bi rexma hindê ku Turjanî liba Simkoyî kar dikir û du ji stûnnivîsên rojnameyê nivîsarên xwe wekî dadwerên ji hêla Simkoyî destnîşankirî ve îmze dikirin. Temeddun behsa rojnamê te hûrgilî dike jiber ku rojname di weşanxaneya wî ya berê de dihate çap kirin, çapxana ku Simkoyî dest danîbû ser. Binêre Temeddun, , 370–71.*

*12.Hwb., 163–68, û Husein Madani, Kurdistan and the Big Powers’ Game, Vol. 2 (Stockholm: Spartryck, 2001), 55–56.*

*13.Madani. Kurdistan and the Big Powers’ Game, Vol. 2, 52.*

*14.Othman Ali, Dirāsat fī l-Harakah al Kurdiya al Mu’āşirah (1833–1946) [Studies of the Contemporary Kurdish Movement (1833–1946)], (Arbil: Maktab al-Tafşīr. 2003), 343.*

*15.Hawar, 168.*

*16.Michael Anthony Reynolds, The Ottoman-Russian Struggle of Anatolia and the Caucasus, 1908–1918, (PhD dissertation, 2003), 120–122.*

*17.Bb. Sorgun, M. Taylan (ed.), Ittihat ve Terakki’den Cumhuriyet’e: Bitmeyen Savaş, Kutulamare Kahramanı Halil Paşa’nın Anıları (Istanbul: 7 Gün Yayınları, 1972), 60.*

*18.Temeddun, 322.*

*19.Faxir Hasangoli, Simko (Iran: Unpublished MA thesis), 14.*

*20.Bb. Temeddun, 371.*

*21.Bb. Iranian National Archive’s records. File: 240003905, No. 2864. 1960.*

*22.Chris Kochera, Kurdish National Movement, trans. Ebrahim Younesi (Tehran: Nigah Press, 1994), 64.*

*23.Hasangoli, Simko, 37.*

*24.Temeddun, 322.*

*25.Kesrewî, The18 Year History of Azarbayjan, Vol. 2., 830.*

*26.Banani, 39.*

*27.Zirinsky, 5.*

*28.Gelekên din jî heman hejmaran didin. Binêre Wadie Jwaideh, The Kurdish National Movement: Its Origins and Development, (Syracuse: Syracuse University Press, 2006); Kamal Muhar Ahmad, Kurdistan during the First World War, (London: Saqi Books, 1994); Maria T. O’Shea, Trapped Between the Map and Reality: Geography and Perceptions of Kurdistan, (New York: Routledge, 2004), 100.*

*29.Zirinsky, 8.*

*30.Hwb., 8–9.*

*31.Barazuyi, 162–3*

## Di navbera bîranîn û bîr'ne'anînê de

# "Desteyek Ji Çîroka Jiyana Min"

FEXRIYA ADSAY

Di nav salên dawî de aktorên siyasî yên kurd ku bîranînên xwe dinivîsînin û didin çapkirin zêde dibe. Ger em bînin bîra xwe ku berhemên bi vî awayî yek ji çavkanîyên sereke yên dîroknigarîya liser rewşa aborî, siyasî û çandî ya civakekê ye, bîranîn çiqas zêde bihên nivîsîn rohnîya liser dîroka civakê jî dê ewqasî zêde bibe. Em dizanin di destpêka sedsala bîstem de ku hemî cîhan di nav guherîneka radîkal re derbas dibû, gelek aktorên kurd jî di nav vê guherînê de cî girtin. Ji wê serdemê îro gelek nav wekî lehengên serhildanan, endamên rêxistin û partîyên siyasî, dîplomat, nivîskarên kovar û rojnameyan hwd dihên bîra me. Lê ji wan êwran bîranînên van kesayetan kêm in. Doza Kurdistana Zinar Silopî (Qedrî Cemîl Paşa) û Ağrı Dağı İsyanı [Serhildana Çiyayê Agirîyê] ya Ihsan Nûrî Paşa û Rojên Almanyayê ya Celadet Alî Bedirxan çend mînakên degmen in. Her yek ji wan bo dem û mekana xwe çavkanîyên bêhempa ne; bêyî wan dîroka dem û mekanên wan nahên nivîsîn.



Yek ji wan bîranînan ku ji îro ve bo dîroknigarîya kurd çavkanîyeka girîng e, pirtûka Mehmûd Yeşil ya bi navê Desteyek Ji Çîroka Jiyana Min e (Weşanên Doz, 2009, Stenbol). Di dahatîyê de dema şahidên dewra 40-50 sal berê êdî nemînin, wekî gelek berhemên din, qedrê vê berhemê jî dê bêhtir bihêt zanîn. Mehmûd Yeşil di sala 1938a de li gundê Garisîya bi ser Silîvayê, ku jiber peywira bavê wî ya melatîyê li wê derê bûne, hatiye dinyayê. Malbata wî bixwe ji gundê Baxça ya bi ser Silîva ve ye û li wir mezin bûye. Di Gulana 2016an de çû ser dilovanîya Xwedê. Digel ku ev pirtûk dikare ji çendîn alîyan ve bihêt nirxandin lê di vê nivîsê de ez dê bi tenê li dû van sê pirsan biçim: Gelo bîranînên Mehmûd Yeşil bo çi an ligor çi çavkanîyeka girîng e? Mirov dikare di kîjan çarçoveyê de wan binirxîne? Gelo piştî xwandinê kîjan pirsan li dû xwe dihêle?

## Bi xwandineka xwemalî

Mehmûd Yeşil bi xwe û bîranînên xwe dijî vatişa çep û kemalîstan daneyên biqîmet dihewîne, vatişa ku têra xwe niqutîye hundirê hişmendîya siyasî ya kurdan. Ligor vê vatişê şêx û mela an bi giştî hêmanên dînî û hêmanên civakî yên nerîtî paşverûtîyê temsîl dikin û liber netewesazî an dewletbûna kurdan hertim bûne asteng. Bi taybetî piştî ku siyaseta kurdî ket bin bandora aktorên siyasî klîka ku ji xwandegehên fermî yên dewletê derçûne û medreseyên kurdî berêvka îtibar û bandora xwe ya di nav xwandayên kurd de winda kir, ev vatiş hîn zaltir bû. Êdî dîroka serdemên berê, serdemên ku dîndarîyeka nerîtî bûbû binemayên şêwazeka din a jiyana civakî, ji peywenda xwe hat derxistin û bi ruwangeheka pozîtîvîst hat xwandin, hilsengandin, vedariştin û nivîsîn. Pêdivî bi hindê nîne ku mirov heta serdema Şêx Ubeydullah, Mela Selîm, Şêx Seîd, Şêx Riza hwd. dûr biçe; piranîya kadrên siyasî yên wekî Mehmûd Yeşil ku li Silîva çalak bûn bi nerîtên dînî hatibûn mezin kirin; yan bi tenê li medreseyên kurdî xwandibûn yan jî pir kêm meirûzî xwandegehên fermî û sazîyên modern bûbûn. Bir rexma vê çendê, nerîtên dînî yan tenanet bawerîyên dînî teşe nedabû nasnameya wan a siyasî û bi wî teherî, liber welatparêzî û neteweperweriya wan nebûbû kosp. Yeşil bixwe ji malbateka şêxan bû; medrese xwandibû, çend salan meletî kiribû û dûre dest ji meletîyê berdabû û dest bi bazirganîyê kiribû. Di van qonaxan hemîyan de kurdayetî her dîsan beşeka serekî ya zanavê kurdayetîya wî bû.

Di seranserê pirtûkê de em dibin şahid ku ew di navbera dîndarî (yan nasnameya umetî) û nasnameya neteweyî de dudil nemaye, berovajî, paşxana wî ya dînî hander bûye jibo kurdayetîya wî, jiber ku şêxîtîya malbatê, xwandina medrese û meletîyê helmetên wî yên neteweperweriyê bercestetir kirine; çunkû li medrese û malbatê bi berhemên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Siyapoş û Ehmedê Xanî hatiye rahînan. Digel van di jiyana xwe ya rojane de jî karîye têra xwe rasyonel tev bigere, wekî mînak ne dijî faîzê ye. Heta ew jî ber bayê çepîtî û sosyalîzmê dikeve lê ev jî dîndarî an neteweperwerîya wî re nabe rikber. Dîndarên derveyî siyaseta kurd dema wî bi murtedîyê tawanbar dikin ew bi rihetî jî heq wan tê der. Dema li gund meletîyê dike şaşika xwe dide serê xwe lê derveyî gund kes wî bi şaşikê nabîne, di jiyana civakî de nafikire nifuza şaşikê bi kar bîne. Yanê, bi giştî ji pirtûkê diyar dibe ku wê çaxê awayekê din yê dîndarîyê hebûye û belkî tovên sekulerîzmeka xwemalî jî di xwe de hewandiye, belkî jî dîndarîyeka neteweparêz di seretaya werarê de bûye. Em niha li Bakur dibînin siyaseta derçûyên zanîngeh û xwandegehên dewletê bi îdeolojîyên sekuler kurd nêzîkî rizgarîya neteweyî nekiriye. Belkî wextê wê hatiye em bi nêrîneka hîn bêtir giştgirane (inclusive) li pêşîyên xwe binêrin û ruwangeha dîroknigarîyê biguherîn; di navbera nifşên îro û yên berê de pirekê ava bikin. Yeşil behsa civîneka çapamenîyê ya sala 1991ê dike ku li wir çend xort bêsebeb sloganan davêjin û dibin sedema mudaxeleya polîsan. Yeşil xortekê hinda xwe hişyar dike ku wisa neke, ew xort vê dibêje: "Jixwe hûn paşverû ne, hûn nahêlin meriv tiştekî bike". Bi vê anekdotê Yeşil belkî hewl dide balê bikişîne ser nebûna vê pira di navber nifşan de.

Divêt mirov li hindê haydar be, ku tovên gelek niqaşên derbarê hişmendîya siyasî ya kurd jî di wê dewrê de hatine avêtin. Em partîyên nêz-dewlet ên wekî AP, DP daynin aliyekî, dema siyaseta kurd partîyên xwe hîn ava nekiribûn siyaseta sosyalîst a TÎPê û bayê xurt ê sosoyalîzmê di nav kurdan de bûbû sedema dijberîyên girîng. Hevoka Niyazî Ustayê navdar mînakek e bo vê: "Ez jibo kurdîtîyê rojekê ranazêm lê jibo komunîzmê 16 salan radizêm" (r.174).

**Perwerdeya medreseyê**

Yeşil bi hûrgilî behsa gihandin û perwerdeya feqîyan dike ku kanîya sîstema wê gundî bixwe bûn. Wan feqî xwedî dikirin, pêdivîyên xwarin û paqijîyê wan dabîn dikirin. Mele bixwe jî ji dewletê mûçe nedistandin û ne girêdayî dewletê bûn. Lewma bi qewlî şêx "mele û feqî gelek caran, ... tiştên dewletê qedexe kiribûn, dikirin. Wan xwe bi dewletê girêdayî nedidîtin. Rizqê wan ne ji dewletê lê ji milet dihat. Wan jî berjewendîyên gelê xwe di ber çavan re derbas dikirin ... ji dewletê azad difikirin..." Mirov nikare tiştên çûye şûnde vegerîne û jixwe pêdivîyên îro jî cuda ne lê bi vê helkeftê em dikarin careka din lister encamên perwerdeya dewletê/fermî bifikirin. Em gavekê wêdetir biçin û ji kanîya rewşenbîrî an siyaseteka organîk, bêyî haşa jî rabirdûya xwe, bêyî bênirxkirina çûyîyên xwe, ji freçeşnîya cîhanê sûd wergirin ş pê xwe dewlemend bikin.



## Bi xwandineka dij-dîroknigarîya fermî

Birastî lipişt nivîsîna piranîya bîranîn an otobiyografîyan hewldana avakirina dahatîyeka baştir di bin sîya azmûn û dersên dema xwe de heye. Wekî din, jibo bîreka civakî ya xurt çê bibe hewldana hilguhestina azmûnên dewra nivîskar bixwe li kar e. Bîranîn gelek caran awayekê tevkarî, îtiraz an midaxelekirina dîroknigarîyê ye an hewleka pêşîgirtin li jibîrkirina dewra xwe ye. Lewma bîranîn bi qasî ku amrazên dîroknigarîyê ne, dikarin bibin amrazên hilriştina (deconstruction) dîrokên fermî jî. Bo me kurdan herî kêm du dîrokên fermî hene: yek a dewlet/ên serdest, yek jî ya rêxistin an tevgerên siyasî yên serdest di nav kurdan de . Bîranînên Yeşil dikare him bo hilriştina dîroka fermî ya dewleta tirk him dîroka fermî ya tevgera PKK ku bo kurdên Bakur darişti ye bê xwandin.

Mehmûd Yeşil ji wan kesan e ku ji salên 1950yan ve fikrên kurdayetîyê pê re çêbûye û di nav tevgera hişyarbûna neteweyî ya kurdan a piştî Şerê Cîhanî yê Duyem de bi awayekê çalak cih girtiye. Ji agirê Newrozê bigire heta mîtîngên petrolê û azadîya kurdan, ew û kadroyên salên 1960 û 1970yan bûne pêşengên gelek çalakîyên vejandina hestên neteweyî. Tevî Mele Evdilkerîm Ceyhan û Şêx Mihemed Şakir bi awayekê de facto di 1960î de PDK, wekî rêxistina siyasî ya ewil li bakur damezrandine; di salên 1970yî de bûye alîgirê damezrandina DDKOyê. Mijara vê nivîsê ne ravekirina hemî çalakî û bûyerên wê demê ye. Lê digel ewqas xebat û çalakîyên girîng û seferberkirina gel, nifşên piştî salên 1980-90î mezin bûne piranî dîroka tevgera kurd bi PKK didin dest pê kirin an wisa dizanin. Jiber ku PKK destpêka dîroka Bakur bi xwe ve dide girê dan. Kesên wekî Mehmûd Yeşîl, Muhterem Biçimli, Mehmûd Okutucu, Şêx Mihemed Şêrîn, Rojen Barnas, Mehdî Bûdak hwd. di nav nifşê nû de nahên nas kirin; wekî ku tunebin hatine hesab kirin û lewre ji azmûnên vî nifşî istifade nehatiye kirin û bi ser de xwastine ew bihêne ji bîr kirin. Lewma di pêşgotinê de Yeşil diyar dike ku "hîmên tevgera kurdî ya îroyîn di salên şêstî de hatiye avêtin" (r.12). Ev hevok bi serê xwe îtirazek e li hemberî dîroka fermî ya siyaseta PKK û zanîna nifşê aniha. Wekî din ew welatperwerîya xwe digihîne Tevgera Şêx Seîd, Agirî, Dêrsîm, Xoybûn, Binxet û Mela Mistefa Barzanî û bi taybetî bi nivîsîna bîranînên xwe dixwaze, berovajî çavpoşîkirina tevgera serdest li vê dîrokê, vê berdewamîya dîrokî dupat bike. Ev dikare wekî hişyarîyekê bo dîroknigarên dahatîyê bihêt xwandin.

## Dîlên Filistînî û darûxandina vatişa çep li Hewlêrê

Yeşil bi awayekî dosta kurdan rojnamegera almanî Lissy Schmidtê nas dike. Schmidt jî wekî her çepgirên ewropî piştevaneka doza filistinîyan bû. Yeşil jiber ku filistinî hemberî kurdan alîkarîya Sedam Husên dikin, hemberî wan ne ewqas erênî ye. Ev cudatîya di navbera Yeşil û van de carekê xuya dike lê nikare bi awayekê eşkere vê ji Schimdt re bêje; difikire ku dê nikaribe vê yekê pê bide têgihandin. Schmidt bixwe li Hewlêrê rastî kampeka filistînîyan dihêt ku bo şerê kurdan hatine Kurdistanê û hatine dil girtin. Schmidt pir ecêbmayî dimîne û vê carê fam nake ew hîn çima nehatine kuştin! Ev anekdot feraseta keseka wekî Schmidtê radigîne û berawird dike bi ya kurdan re; ku hîn liser feraseta berê dimeşin.

**'Ne'bîranîn**

Gelek caran di nivîsîna bîranînan de bi qasî ku tiştên dihêne bîra mirovî ewqas tişt jî dihên 'jibîrkirin' an bi gotineka din dihên oto-sansur kirin. Yeşil di pêşgotinê de gotiye tiştên di pirtûkê de cih negirtine dê demeka din binivîsine lê em nizanin ew çi ne. Lewma em ligor ên nivîsandî biçin ne zehmet e ku mirov bêje Yeşil qet nexwastiye qala tevgera PKK ku ew jî destpêkê ve bûye şahidê wê, bike. Tenê bi hevokekê jî qal nekiriye. Gelo mumkun e tişteki ku Yeşil liser PKK bêje tunebe? Qet bîranîneka wê hêjayî vegêrranê nebûye? Mumkun e gelo hemberî tevgereka ku wî şahidîya peydabûna wê kiriye erênî an neyênî helwêsteka wî tunebe? Gelo sedema vê oto-sansurê çi bû? Di bîranînan de qasî tiştên hatiye gotin ên nehatine gotin jî girîng in û hêja ne mirov liser wan bifikire. Sedem her çi be kêmasîyeka mezin e ku em wekî xwîner û nifşên bi dû wî re nabînin ka mirovekê wekî Mehmûd Yeşil derbarê tevgereka ku nêzî sî salan e di nav kurdan de serdest e, çi difikirî, helwêsta wî çi bû. Bawer im xwedîyê bîranînan çiqas kêm xwe sansur bikin ewqas zêde dê bikaribin dîrokên fermî hilweşînin û bo nifşên ayinde dîroka siyasî rohntir bikin.

# Jinên kurd di pantaya dîrokê de



PIRJÎN SALIH

Piştî berxwedana qehremanane ya jinên kurd vê dawiyê gelek behsa wan di medyayên cîhanî de hat kirin. Jibo raya giştî ya cîhanê, bi taybet Rojavayê, ku liser Rojhilata Navîn xwedîyê gelek pêşdaweriyan nin, ev diyardeyeka awarte bû. Lê jibo kurdan rola jinê, bi rexma gelek bend û bestên civakî û dînî, berovajî civakên cîran, li pêş bûye û dîrok gewahê wê yekê ye. Bi dirêjahîya şorişê kurd jinên kurd jî li her çar parçeyan bûne hêmayên berxwedan û fîdakarîyê. Hembajarîya min ji alîyê daikê ve, Leyla Qasim di bîr û hafizeya me de hertim cihekê dîyar hebûye. Bi merema bilindragirtina bîra wê û hemî jinên kurd yên ku di pênava kurdayetîyê de xwe canbext kirine, me awirek da dîrokê, ka di vegêrranên biyanî de jinên kurd çawan hatine wêne kirin. Zêdebarî vê çendê, di dîroknigarîya kurdî de jî jinan cihekê taybet heye; yekem dîroknigara jin li Rojhilata Navîn Mestûre Kurdistanî ya xelka bajarê Sineya Rojhilatê ye, ku, bilî berhemên edebî, dîroka Mîrnişîna Erdelan nivîsîye. Di hêla civakî û siyasî de jî jinên kurd xwedîyê roleka giring bûne; tenanet serekîya beşek ji civaka kurd jî kirine. Adela Xanim a Caf di destpêka sedsala borî de, piştî mirina hevjînê xwe, serokatîya eşîreta Caf û deşta Şehrezûrê li stû girtiye.

Di şorişa eylûlê, ku di destpêka salên şêstî de dest pê kir, keçeka krîstiyan, bi navê Margaret Corc roleka hêmayî hebû. Ev nivîs zêdetir bala xwe dide wênekirina jinên kurd ligor çend çavkanîyên ewropî, lê em dizanin di dîroknigarî û berhemên dînî û edebî yên Rojhilata Navîn de jî navên gelek jinên navdar ên kurd derbas bûne. Jinên kurd di hêla edebî û perwerdeyî de pêgehên giring bi dest anîne. Bo mînak sitî Lubabe Kurdî, kiça emîrekê kurdê Mûsilê û dayîka Merwan kurê Muhemmed kurê Merwan yek ji melikên Umewî bû, ku di nîveka sedsala 8an de jiyaye. Fexr ul-Nisa Şehdeya Dînewerî (1092-1178), Umm Muhemmed Hekarî (m. 1314), Fatime keça Ibrahîmê Hekarî (1284-1356), her du xwîşkên Esma Xatûn Hekarî (1315-1368) û Cuweyriye Xatûn Hekarî (m. 1383), Selma Xatûn Cezîrî, Ayşe û Fatime Cezerî, Ummetullah Xatun Kurdî Hekarî, Fatime Xatûn Goranî ku hemî jinên navdar ên kurd di warên ehkam û fiqha islamî de pispor bûne di sedsalên 13-14an de jiyane. Di sedsalên navîn de ji nav cihûyan tenê li Kurdistanê jineka alim derketî ye, ew jî Asent Barzanî ye. Asenat Barzanî (1560-1635) keça rabîn Şmuel b. Netanel Haxamê Kurdistanê, di nav komelgeha cihûyan de dibe yekemîn rabîna jin. Asenat Barzanî ji navçeya Barzanê bû.

Bi rexma sînorkirinên nerîtî û dînî di civakê de, dîsan wan karîye pêgeha xwe ta radeyeka berçav biparêzin; xasma dema ku dîndarîya kurdî ne mekanîzma rituelên kontrolê lê ji fiqhê zêdetir rehberê zuhd û teqwayê bû. Jinên kurd gelek caran ne ebdên zelaman, lê şirîkên biryarên wan di proseyên giring yên civakî û siyasî de bûn. Li vir çend mînak ji vegêrranên biyanîyan liser jinên kurd dihêne eşkere kirin.

**C, J Rich (1836:284), Vegêrrana Lêmanekê li Kurdistanê, berg 1, (Narrative of a residence in Koordistan)**

Ji vî dimenî renge zêdekirin fuzûlî be û pêdivî bi gotinê nebe jî, lê jinên kurd hindî yên tirk û tenanet yên ereb ne şermîn û goşegîr in. Kesên nêrîne jî di huzûra xwe de qebûl dikin, û liba biyanîyan serûçavê xwe venaşêrin. Wekî jinên bexdadî çarçevên reş xwe vedişêrin, gava hingê serçavê xwe vedişêrin, gava ku navdar bin û nexwazin di nav bajêr de bihêne nasîn.

**R Wilbraham (1839:326), Gerên li wîlayetên Trans-Kafkaz yên Rûsyayê (Travels in the Trans-Caucasian provinces of Russia)**

Di nava muhemmediyan (misilmanan) de jinên kurdan bêhîcab in; ew ne tenê beşdarî renc û zehmetên şû û brayên xwe dibin, herwiha di hunerê swarîyê de bi wan re dikevine berîkanê.

**Robert Mignan (1839:298,299), Rêvingîyeka Zivistianê di nav Ûristêtê … re heta Kurdistanê (A winter journey through Russia, the Caucasian Alps, and Georgia, Volym 1)**

Jinên vî welatî di çardiwarên heremê de nehatine hebis kirin, ne jî rûyê wan dapoşandî ye, û, herçî azadîya gotar û kirdarê be, ew tam hevtayên xanimên ewropî ne.

**H. Southgate (1840:138), Vegêrrana tûrekê li Ermenistan, Kurdistan û Ecemistanê (Narrative of a tour through Armenia, Kurdistan, Persia, Volym II)**

Gava ku ez jinên kurd bi yên tirk û ecem re berawird dikim, yekser bi giringîya zêde ya jinên kurd di nav malbatê de dihesim. Bi rastî jî, yek ji tiştên degmen li Rojhilatê, ku Rojavayê dihine bîra mirovî, pêgeha jina kurd e. Bi taybet di hêla şêwazê serbest û reha yê ku ew bi zelamên xwe re helsûkeftê dikin, mirov dibîne ew bi wan re hevseng in û gelek caran bi hewayekê hukimdar bi wan re didin û distînin. Di berawird bi cîranê wan re, di navbera jin û mêrên kurd de hevbawerî û piştgirîya dualî hîn bêhtir e.

**F. R. Chesney (1850:127), Sefera Keşfa Rûbarên Ferat û Dicleyê (The expedition for the survey of the rivers Euphrates and Tigris)**

Berovajî cihên din li Rojhilatê, jinên kurd bedena xwe zêda danapoşin û xwe goşenişîn nakin. Kebanîtî û karûbarê malê, rast e, liser milê wan e, lê di vê navberê de dikarin bi mêvan yan bazina malbatê re li dora tendûrê bidin û bistînin.

Gava ku mirov dikeve mala yekê kurd de, jinên malê venaciqin û heryek, jibo ku xwe veşêrin, bi aliyekî de narevin. Di mawê mayîna me di nav wan de, me gelek caran ew bêyî hicab dîtin; tenanet demê zelam jî di civatê de hebûya. Gava ku jinên kurd hatin seredana xanima min, ji min nexwastin ez ji wir dûr kevim, berovajî, hez dikirin ez li wir liba wan bimînim. Pir serincrakêş e, ku di nav hejmareka mezin ya qebîleyên şerqî de, yên ku nefsbiçûkî û xulq û xûyên xwe parastine jinên kurd in.

**Prenses Belgiojoso, (1862:419), Heremsera û Dîmenên Şerqî (Oriental Harems and Scenery, Princess Belgiojoso, New York)**

Li herderî min dît, ku jinên kurd, ku bedew û jîr in, bi rûyên vekirî dimeşin û bi awirên bi guman li jinên tirk dinêrin, ku hem di bin çarşevê û hem di bin abajûrên bi mûyê hespan hûnayî de du caran hatine dapoşandin. Lê jinên kurd tevî zelamên xwe derdikevin oxirên pirmacera; oxirên ku bêyî zeka û hêza wan ne muyeser e. Hez û hewesa wan, yan qet nebe hestên wan, bêyî parvekirina hêvî û metirsîyan bi zelamên wan re muyeser nabe; di dahîneriya xwe de bala wan jibo jîngeha wan di astê herî bilind de ye.

**W. Clark (1864:42), The New Englander: Hozên Kurd yên Rojavayê Asyayê (The New Englander: The Kurdish tribes of western Asia, Volym 23)**

Mercên jinên kurd di gelek waran de bi ser mercên hemî jinên oryantal, ku nivîskar lê rast hatîye, ercehtir e. Exlaqê wan ji yê jinên tirk gelekê qenctir e, tenanet ji exlaqê jinên kristiyan yên şerqê jî berztir e. Ji alîyê şûyên xwe ve wekî hevta dihêne hejmartin û kenê xwe bi koletîya jinên tirk dihînin û bi çavekî kêm li wan dinêrin. Jibo mêvanên xwe mêvanperwer û baldar in; tevî zelam û êl û eşîra xwe azadane bi wan re mijûlî axaftinê dibin. Bêyî hicab dihên û diçin, lê bi heya, bi hurmet, bi fezîlet û sade ne û bedgumanîyê nakin. Semîmîyeteka wan heye, ku hem balkêş e hem jî dilveker. Jinên kurd hem pir bi zeka ne hem jî pir dahîner. Yên ku li konan yan li malan dimînin, wextê xwe bi çêkirina tevn û mehfûran derbas dikin… Pir bedew in û afirînerîya xwe selmandine.

**F Millingen (1870:180), Kovara Etûdên Etnolojîk ya Londonê, Derheqa Kurdan de (Journal of Ethnological society of London, On the Kurds)**

Jinên kurd bêhisab bi exlaq û bi heya ne; di karakterê wan de birryardarî û qatibûna mêranîyê heye. Di danûstandina wan bi mêran re mirov vê yekê dibîne, ku serbestîya wan di vê danûstandinê de berovajî dînê misilmanan e. Jineka kurd ji karûbar, plan û peyrew û komployên hoza xwe haydar e; bi teherekî ew hema giyan û ruhê tevgêr yên karûbarên malbat û eşîrê ye. Çawan ku wekî zelaman bi helmet û sersext in, gava pêdivî be, her dîsan wekî zelaman amade ne jibo oxirên bixêr û nebixêr xwe bavêjin ser zînê hespên xwe.

## Strana Ellamezar e çîroka berxwedana ciwanên kurmanc ên Xorasanê



EZÎZ EHMED

Xorasan, welatê sema, lorîn û dutarê ye. Welatê qêrîna strana Ellamezar û strana Lê Yarê ye. Ellamezar ji hemû kurmancên Xorasanê re straneka navdar e, çîroka berxwedana ciwanên kurmanc ên Xorasanê ye li hember dagirkerîya dijmin.

Kes bi qencî nizane kakengê ev stran hatiye hûnan, lê herkes liser wê yekê hevbîr in ku dema kurmanc diçin zozanan, hinek ciwanên gund diminin daku parastina gundê xwe bikin.

Di wê demê de eşîrên dagirker yên ozbek jibo xwe fersend dibînin û êriş dikin ser gundên wan, lê rastî berxwedaneka bêhempa ya ciwanan dibin û ew ciwan bi canê xwe paratina erd û welatê xwe dikin.

Dema ku eşîrên koçer vedigerin ku ciwan û lawên xwe hembêz bikin û keçik piştî çend mehan bi destgirtiyê xwe şa bibin, dibînin ti kes nemaye û tenê hinek gor û mezel wekî yadgar bi cih mane. Hemîyan xwe di pênava niştîmanê xwe de feda kirin û canbextbûna wan şiwenê di dilê dêûbav û xweşdiviyên wan de ebedî dike.

Çîroka Ellamezarê liser wê bûyerê ye; bûkeka nû lipey gora şûyê xwe digere û wî nabîne, û dest bi lorînê dike û rêvingekê dutarjen, yanê yê ku saza kurmancên Xorasanê ya bi nav Dutar dijene, wê dîmenê dibîne û dibêje: Va çi rojigar e! Berê xwe dide rûberên dîrokê û mêrxasîya ciwanên kurd bi dutara xwe wih bi lêv dike.

*Derdê le me gurr bûyînî*
*Çiya bûyî awir heltînî*
*Wa je virana kes newînî*
*Ellamezar e, mezar e!*
*Va çi rûzigar e!*

*Derdê le me bûne hezar*
*Xudê yek e, bende hezar*
*Ellamezar e, mezar e!*
*Va çi rûzigar e!*
*Xerîv raguzar e!*

*Newinim derdê cudayî*
*Cism û can le me nemayî*
*Le çavan nemayî roşinayî*
*Ellamezar e, mezar e!*
*Va çi rûzigar e!*
*Xerîv raguzar e!*

*Awir: agir, Rûzgar: felek, raguzar: rêwî, roşinayî: ronahî*





*"- Seba kilamêka to dawetêk de vatbî, hende surgunîye rewa bî seba kilamêk?*
*- Belê Murad can! a kilame, kilama Halebçe bîye*
*- Belê, ewro zî Roboskî yo Kobanî ya Şengal o. Trajedîya kurdan nêxelisîyena gelo?*
*-Ti zanî Murad can? Nameyê na trajedîye bêwelatîye ya "*
*(fîlmî ra dîyalogêk; kurmanckî ra)*

## Surgunî ra agêrayîşê yew kilame:

# Kurdistan Kurdistan

MUTLU CAN

Kurdistan… Sêneyê Rojhelatê Mîyanênî de welatêko sey behiştî la letekerde. Kesk û sûr û zerdê xo se û neway û hîrê welatan ra weşêr la qederê xo sîyayî ra sîyayêr. Herçiqas Îbnî Xaldun vajo "cografya qeder o" zî ez bi xo emîn nîya ke gelo merdimî, welatê xo ver benê bêqeder yan welatî, merdimanê xo ver? Beno ke ne persî qîm bikerê ne zî cewabî semedê tesfîrê trajedîya kurdan. Çîyo ke ma ci ra vanê huner o, tam zî wextanê winasîyan de keweno rojev. Ma vejeno raywanîye. Raywanîya ke ma rayîr ra agêrênê rastîya xo ser, dejan û daruyanê xo nas kenê.

Ez do şima rê yew fîlmo dokumantero ke hikayeya xo, yew raywanîye ser o awan bîyo ra qal bika. Raywanîyêka rastkêne ya hunermendêkê kurdî. Nameyê hunermendî Delîl Dîlanar o, yê fîlmî zî Kurdistan Kurdistan. Labelê ez wazena vêrê ke derbazê fîlmî biba ez senî û kamcîn şertan mîyan de şîya beşdarê nawîyayîşê nê fîlmî bîya, tayê ey ra qal bika. Seke şima zî zanê mewsîman ra zimistan o. Mi, va zimistan o la ma yew serrî ra zêdeyêr o ke ne mewsîman ra tehm gênê ne aşman ra nê zî rojan ra. Tena rîyanê yewbînan ra rêçanê hêvî gêrêne. "Zulumkarî zî ha şayîya zulmê xo de yê." Rojanê winasîyan yê Dîyarbekirî de, rojêka kanûna 2016î de xebera mi bîye ke Festivala Filman ya Amedî ya 2. bêra viraştene. Hende şertanê xiraban mîyan de yew aktîvîteya hunerî ancax bîye wesîleyê peşmirîyayîşê mi. Rojêka şilî û şepeline de, danê şanî ez keyeyî ra vejîya û kewta rayîr. Çunke a şewe programê festivale de fîlmê kurdano ke mi tewr zaf waştêne temaşeyê ci bika, o fîlm estbî. Ez ancax resaya Cemxaneyê Komela Pîr Sultan Abdalî yê Amedî. Beno ke tayê şima, êyê ke festîvala emserine ra melumatê xo çin bî tede heyret bimanê; fîlm û yew cemxane? Eke şima xo sey hemparê qederê welatî vînenê ganî naye ecêb nêvîne. Çunke mi cor ra zî tîke behs kerd ke wext, wextê şayîya zulimkaran o. Xulasa tam demê destpêkerdişê "Kurdistan Kurdistanî" de ez adresa nawîyayîşê fîlmî de bîya.

**Mi temaşeyê fîlmî kerd**

Eke şima beşê sînopsîsê fîlmî biwanê xora derheqê mewzûyê fîlmî de benê wayîrê melumatî. Amancê mi oyo ke çimê mi de "Kurdistan Kurdistan" fîlmêko senîn o? Mi ser o çi tesîr kerd? Nînan şima reyde pare bika. No mîyan de ez ganî ilawe bika derheqê sînema de yew zanayîşê min o nîspî esto û bê ey zî ez sînema ra hes kena. Hetta kolleksîyonê mino fîlman o mutewazî daxî esto. Beno ke no zî seba tayînan bibo sedem ke bala xo bidê şiroveyanê mi ser. Verê verkan ez ganî vaja ke "Kurdistan Kurdistan, fîlmêko dokûmanter" û serkewte yo." Eşkayo derde xo îfade biko. Kaykerdoxê serekeyî, pêroyê ekîbê fîlmî û helbet rejîsor Bulent Gunduz teqdîrêkê xurtî heq kenê. Fîlmî ra dima eynî ca de rejîsor Bulent Gunduzî reyde yew programê soxbetî ameybî organîzekerdiş. Çîye ke mi uca rejîsorî ra vatî wa no quncik de tarixî rê not bimanê.

"Birêz Gunduz ez verê cû to û ekibe to pîroz kena û verê nê eserê şima de bi hurmet … Fîlmê şima heqîqeten zaf weş bi mi şî. Şima eserêko hunerî veto meydan… Eke ti bi no hawa fîlmanê bikalîteyan biancê Bulent Gunduz ez bawer kena ke ti bibî Tony Gatlîfê kurdan"

Hikayeya surgunbîyayîş û agêrayîşê Dîlanarî nimûneyêka sembolîk a ke hema-hema her merdimo kurd eşkeno tede cuya xo ra çend çîyan bivîno. Çunke fîlm herçiqas welatê xo rê agêrayîşê ey neqlê perdeya sîpîye kerdo zî bingeyê xo de kulturê dengbejîye esto. Tim yeno vatiş ke dengbejîyê xafizaya fekkî yê kulturê kurdan a. Raşt o, la tena hende nîyo. Kilamê dengbejan atmosferê domanîya ma ra zaf çîyan îhtîva kenê. Seke yê Delîlî de zî kenê. Tayê kurdê ma estê ke dengbejîyê şirayetê ruhê înan kerda. Îfadeyê Bulent Gunduzî yê cêrênî manaya winasî nîşan danê:

"Çîrokê ke mi, şewanê derganê zimistanî yê Serhedî de goşdarî kerdêne û rojanê efsunkerdeyan yê domanîya mi ra goşê mi de mendbîy seke her roj venga mi dayêne. Xebata mina dokumantare ya tewr verêne fîlmê Evdalê Zeynike bî. Seke yeno zanayîş Evdal pîrê dengbêjan o. Heqê dengbejan mi ser o zaf bî û mi coka na xebate kerde."

Kurdistan Kurdistan tena wayîrê rengê fokloriki nîyo. Tede aw û koyan ra bigîrin hetanî mesajanê nimiteyan zaf mefhumê madî û manewî yê kurdan bi hawayo armonik dîyayê. Xora no uslûb zaf normal o çunke ma bîyarin xo vîr ke sînemaya kurdan tayê zî sînemayêka surgun a. Ma, bi tespîtanê pisporê sînema Prof. Hamîd Nafîcyî dewam bike: "Rejîsorê ke surgun û dîyaspora de manenê, fîlmanê înan de çend dimenê tebîetî û elementê kulturî – sey koyan, awanîyanê tarixîyan, xirabeyan- ser o hende bi terzêko xurt û tesîrin êno vindertiş, ke nê îmajî û dîmenî êdî benê temsîlkarê yew miletî"

Goreyê mi îcab keno ke merdim ne fîlmî ser o hîna zaf çîyan vajo la cayê ma sînorkerde yo. Aye ra ez nika bala şima bianca yewna xususîyetê fîlmî ser. Kurdistan Kurdistan programê 22 festivalan de ca girewto, gelek xelatî qezenc kerdê û seke qismê şima zî zanê nawîyayîşê fîlmî Tirkîya de ameyo qedexe kerdene. Gunduzî, no derheq de a şewe wina qisey kerd "Jurîya festivalêka Tirkîya ra yewî, mi ra va ke 'nameyê fîlmê xo bivurne, yewna çî bike ke ma fîlmê to daxilê festivale bikê' Mi va; 'temam beno.' Merik heyret mend -herhal bawer nêkerdbî ke hende lez mi îqna biko- û va ma çi bibo? Mi va 'reyna Kurdistan Kurdistan…' No rêaksîyonê ey ra zî dîyar o ke Gunduz, sey rejîsorêko kurd, ferasetê xoyê neteweyî û pespektîfê sînemakarîya xo ra tawîz nêdano. Nêbo, bilasebeb Xelata Festîvala Filman ya Londra Mîyanneteweyî red keno?

Beno ke şima vajê 'ma qet rexneyê to yê nêgatîf çin o nê fîlmî rê ? Esto; senî ke mi rejîsorî ra zî vatbî; Ganî Delîlî o sehne de bivatêne: 'Nameyê na trajedîye bêdewletîye ya'

## Sînopsîsê fîlmî ra




Hunermendo namdaro kurd Delîl Dîlanar semedo ke serranê 1990an de yew veyve de kilamêka kurdkî vano mecbur maneno ke welatê xo terk biko. Vîst serrî dima , New York de yew konserê xo de eşkera keno ke o do agêro bi welatê xo. Herçiqas wexto ke reseno Rasteyê Teyara yê Mûşî vîneno keye û bi seyan heskerdoxê ey ameyê verê ey zî xo, o tawî ra dima temamen tena hîs keno. Wexto ke yeno dewe, karê eyo verên pîrika xo ya ke seba ey zaf erjaye bîya û gama ke o surgun de bîyo şîya rehmet, mezela aye zîyaret kerdene beno. Delîl rojanê verênan de xerîbîye hîs keno, wareza û birazayanê xoyê da-vîstserreyî ke wextê eyê xerîbîye de maya xo ra bîyê nas keno. Keyeyê ey Delîlî rê surprîz kenê û mamostayê ey Egîdê CIMOyo ke Erîwan de maneno dawetê dewe keno. Semedê ameyîşê ey merasîmêk organîze kenê. CIMO, verê Delîlî yeno dewe û ey dûrî ra taqîb keno. Hetanî ke Delîl, cayo ke domanîya xo de Radyoyê Erîwanî goşdarî kerdo, ê cayî vîneno. Delîl seba ke melodîyî ke ey domanîya xo de apê xo reyde goşdarî kerdê newe ra yad biko, vejîyeno bi tumî ke înan ser o radyo goşdarî kerdo û dest bi cenitîşê meyî keno. Delîl nişka (xaftela) ra vengê meyê westayê xo Egîde CIMOyî eşnaweno…

**Egîdê Cimo**

Mîreyê Bilûre Egîde Cimo, 1932 de dewa Erdeşîrî ya Armenîstanî de yeno dinya. Goreyê vatişê ey, keyeyê xo eslê ci de qezaya Bêgirî (Muradiye) ya Wanî ra yo. Seba ke Bêgir de erdlerz bîyo keyeyê ey bar kerdo şîyo Armenîstan û o zî uca ameyo dinya. Serra 1955î de demo ke Radyoyê Dewlete yê Armenîstanî de beşê kurdkî abeno, uca sey muzîsyenêk dest bi xebate keno. Gama ke behsê nê radyoyî ke her çar hetanê Kurdistanî de bi hawayo qedexekerde ameyo goşdarî kerdene abeno, nameyo verên o ke yeno vîrê merdiman yê ey o. Waştişê Casimê Celîlê rehmetî ke o wext berpirsîyarê beşê kurdkî yo dewe bi dewe gêreno, rêça sazbend û dengbêjan taqîb keno ke verê înan bido ver bi rayîrê radyoyî. Ancîya bi vatişê ey 37 serrî Radyoyê Erîwanî de bi bilûrî fîq û meyê xo muzesyenîye kurdî kerda. Kîşta xebatanê xoyê radyoyî de serra 1967î de Enstîtuya Muzîkî yê Romanos Mekîkyanî ra mezun bî. Sey fîlmê Vodka Lîmon yê Hiner Saleemî, dokumanterê Evdalê Zeynikê yê Bulent Gunduzî zafê fîlman de rol kay kerd. Ey bi sayeyê Radyoyê Erîwanî sey Karapetê Xaço û Aslîka Qadire hunermendan hunerê kurdan rê dayî qezenc kerdene. Cimo hema zî Erîwan de ciwîyeno û qasê pêserîya xoya hunerî bi terzê xoyê musahemekar û esprîtuelî zî hunermendanê kurdan yê tewr girdan yê ganîyan ra yew o.

**Delîl Dîlanar**

Delil Dîlanar 1973 de dewa Orgînosî ya Mûşî de maya xo ra bî. Domanîya xo ra tepîya apê xo yê degbêj Huseynê Mûşî de seke mavajîme arêyê dengbejîyede bî pîl. Bi nameyê "Neçîrvan"î yew allbum amade kerd. No albumê ey o verên bî û nameyê xo kilama kilasîka ke bi şiroveyê dengbêjo namdaro kurd Şakiroyî bibî namdare ra girewtbî. Her albumê ey o newe bi bi nameyanê nê tewir kilmanê klasîkan vejîya. Seke êno zanayîş mîyanê kurdan de Radyoyê Erîwanî efsanewî yo. Westayê Meyî yo kurd Egidê Cimoyî zî sayeyê nê radyoyî zerrîya her merdimî/e de ca qezenc kerd. Dîlanarî westayê xo Cimoyî ra di serrî tena dersî nêgirewtî. rêçanê tradîsyonê seserraneyî zî taqîb kerd. O nê di seran de seke çimanê Cimoyî ra ewnîya heyatî ra, ey seke bi goşanê ey goşdarî kerd û zerrîya ey reyde nefes girewt û da. Delîl Dîlanar dengbêjîyê û muzîke rojawanî ardî têlewe û harmonîya ke ci awan kerde, bi aye nameyê xora zaf dano qal kerdene. Dîlanar sedemanê sîyasîyan ver vîst serrî cuya surgunîye ra pey ancax serra 2014î de eşka agêro erdê xo yo ke ser o ameyo dinya.




**Bulent Gunduz**

*(Rejîsor)*

Bulent Gunduz, 1976 de qezaya Gogsî (Qereyazî) ya Erziromî de maya xo ra beno. Beşê muhendîsîya makine yê Unîversîteya Sütçü İmamî qedêneno. Verî Radyo 16 de muxabirîya xeberan keno. Dima ra wendegehê Türker İnanogluyî (Türvak) de dersê sînema û rojnamegî girewtî. Eynî wext de yew rojnameger o. 2007 de bi nameyê Generallerin Mikrofonlu Erleri ve Kürtler (Serbazê Generalan ê bimîkrofonî û Kurdî) ke tede medyaya tirkan rexne kerdêne weşanîya.

*Filmografîya ey:*

*Evdale Zeynike - fîlmo dokumanter (2010)*

*Roboskî Mon Amour - fîlmo dokumanter (2013)*

*Kurdistan Kurdistan - fîlmo dokumanter (2015)*

*Not: Seba ke dosyayanê nê qismî mi rê erşawitî ez rejîsor Bulent Gunduzî rê sipas kena.*

# Çemê çekuyanê qedîman:
# Kovara Vate

MUTLU CAN

Senî ke tarîxê miletan û dewletan de tarîxê muhîmî estê yê ziwanan de zî estê. Her ziwan de tarîxê xebatanê destpêkan, tewiranê cîya-cîyayan de vejîyayîşê eseranê tewr verênan, ronîyayîşê dezgeyanê ziwanan manayayêka zaf girde îfade kenê. Kurdkîya ke qiseykerdoxanê xo ver hîç nêbîya ziwanê dewlete, îmkananê dezgeyanê dewlete ra mehrum menda, warê aye de xebatê ziwanî mendê vileyê roşnvîr û zehmetkeşanê kurdan ser. No xusus zî qiymetê tarîxanê muhîman yê kurdkî hîna biqiymet û pîroz keno. Tarîxê kurdkîya kirmanckî (zazakî) de di serrê tewr muhîmî zî bêguman serrê 1996 û 1997 ê. Seke yeno zanayîş çend kirmancê ke kirmanckî nusenê û mintiqayanê cîya-cîyayan ra yê 1996 de paytextê Swedî, Stockholm de yenê têhet û bi nameyê Grûba Xebate ya Vateyî yew grûbe awan kerde. Amancê na grûbe standardîzekerdişê kirmanckî bî û grûbe a serre ra nata tena standardîzasyonê na lehçe nêkena, eynî wext de arşîvkerdişê çekuyanê fekanê lehçe zî kena. Grûba Xebate ya Vateyî kombîyayîşê xoyê dîyinî (28-31 nîsane 1997) de qerar da ke kovarêka kulturî veja. Hamnanê 1997 de hûmara yewine ya kovara Vateyî çap bîye. Beşê Wendoxan Rê yê kovare de wina vajîyayêne:

*"Wendoxê erjayey,*

*Her kovara (dergîya) ke newe vejiyêna hêvîyanê neweyan îfade kena. Kovara Vate ya ke dest to di ya zî hevîyêda newa ya. Na kovare ebi hêvîya nuştiş, geşkerdiş, averberdişê lehçeya kirmanckî*

*(kirdkî, dimilkî, zazakî) û xizmetkerdiş û xurtkerdişê kulturê kurdan vejiyiyêna. Kovarê inasarênî (winasî) ganî rewna bivejiyaynê, ma erey kewtî; labelê ma nêwaşt ke hîna erey kewî û ma waşt çiyo ke ma dest ra yeno bikî.*

*Kovarî zey projeyan î. Projey estê ke tena xeyalanê kesan de manênî, projey estê ke hetanî cayê şonî, nêmcet manenî; tanî zî estê ke hedefê xo resenî, cay xo gênî. Hêviya ma a ya ke Vate hedefe xo reso"*

Her kovare gama ke dest bi weşanê xo kena teqrîben îfadeyanê corênan xebitnena. La tayê cumleyan ney "Kovarê inasarênî (winasî) ganî rewna bivejiyaynê. Ma erey kewtî labelê ma nêwaşt ke hîna erey kewî û ma waşt çiyo ke ma dest ra yeno bikî. Nusîyayîşê nê tewir cumleyan nêkeweno para nuştoxanê her miletî. Werrekna yê ma rê zî nêkewtenê. Çunke cumleye winasî rastîya trajedîke ya yew ziwanî nîşan danê. Nuştoxê nê cumleyan rasterast nêbo zî atmosferê yew ziwanî ke zafê îmkananê ziwananê bînan ê dinya ra mehrum mendo tesfîr kenê. Neke tena kurdê kirmancî ma kurdî pêro-pîya zaf çîyan de erey mendbîy. Dejê nê erey kewtişî, 'zerey zerrîya yew şaîrê ma ra' xo wina dayene teber:

*"Teyr û tebur*
*gend û gemar*
*kerm û kêz*
*û linç û lêz zî bi name ya*
*Labrê ez…*
*bê name ya ez.*
*Vila bîy namey*
*Vîetnam û Kamboçya û Angola…rê*
*Mi rê nêvajiyey.*
*Ez kewta erey …"*

Teşhîs û tedawî semedê yew doktorî ra çi mana îfade bikê, roşnvîranê miletêkê bindestî rê zî hetê bingeyê fikrî ra eynî çîyan îfade kenê. Aye ra îfadeyê "ma nêwaşt ke hîna erey kewî û ma waşt çiyo ke ma dest ra yeno bikî" yê Grûba Xebate ya Vateyî manayêka tarîxîye nîşan dano. Zemîno ke na grûbe awan kerdo seke bîyo cuwenê lehçeya kirmanckî, kovara Vateyî zî mehsulo yewin o.

## Hûmara 50. Pîroz bo!

Hûmara yewine ya kovara Vateyî de wina vajîyayêne: "Projey estê ke tena xeyalanê kesan de manênî, projey estê ke hetanî cayê şonî, nêmcet manenî; tanî zî estê ke hedefê xo resenî, cay xo gênî. Hêviya ma a ya ke Vate hedefê xo reso" Rasta zî wina bî kovare heta cayê nêşîye; nemcêt nêmende, hedefê xo resaye. Ha çend hewteyo ke hûmara 50. ya Kovara Vate destan de ya; hetê wendoxan û heskerdoxanê kirmanckî ra yena wendiş. Wa humara pancasine pîroz bo. Ma nika zî bala xo bidîn nuşteyê "Wendoxan Rê" ya hûmara pancasine ya kovare ser û mesajê redaksîyonî biwanîn:

**"Wendoxê Delalî**

Bi piştîdayîşê şima, ma bi rîsipênî hûmara pancasine ya kovara Vateyî zî resnaye şima. Bêguman tena seba Vateyî ney, kamcîn kovare bena a zana, weşanîyayîşê hûmara pancasine hadîseyêko zaf gird o. Coka heqê ma esto ke ma bi wendoxan, nuştoxan û destekdayoxanê xo îftîxar bikîn. Na kovare netîceya aqil, rence û îdealanê ma yê muşterekan a. Helbet sey redaksîyonî ma zaf bextîyar îme ke amadekerdiş û weşanayîşê na hûmare bi qismetê ma"

Ez sey wendoxêkê na kovare û xebatkare ziwan û kulturê vana ke raşta zî wina yo; na kovare netîceya aqil, rence û îdealanê ma yê muşterekan a. Qet şik çin o ke amadekarê aye hêzê xo, nuştoxê aye îlhamê xo û helbet wendoxê aye bawerîya xo na rastîye ra peyda kenê. Netîceyê ke na xebate vetê meydan reyna musnêne ma ke merdim ganî teslîmê tarîyîye nêbo. Bawerîya xo bi roşnaya hişmendîya xo bîyaro û tena bi çilayêka qijkêke bo zî yew adir wekero. Bêguman tanîya her adirî vera-vera bena zêde... Adir, tewr zaf ê kesanê ke tarîyîya şewêka serdine ya zimistanî de çolî (yeban) ra mendê, semedê înan biqiymet o. Dinyaya ma de manaya kovara Vateyî manena adirêkê winasî. Mumkin o ke ma xo ci rê deyndar hîs nêkerê? Mi bi xo vatbî seba hûmara pancesine, tîya zî xususen reyna vana: "Mi tehmê wendişê zazakî reya verêne rîpelanê aye ra kewş kerd. Hem na mana de hem zî xususen semedo ke înan musnaybî ke bi lehçeya ma kî kovarêka hunerî-edebî yena vetiş, ez ronayoxanê na kovare rê xo mînetkar hîs kena.






## Wendoxan û nuştoxane aye se va?*

Grûba Xebate ya Vateyî do teberê xizmetanê xoyê bînan de tena bi na xebate xo daxî hertim bi hurmet û mînet yadkerdişî heq bika. Redaksîyonê kovare, seba ke derheqê kovare de fikir, vînayîş û peşnîyazê înan bigîro ez zî tede pancês kesan reyde roportajî kerdbîy û nê roportajî seke ameybî vatêne hûmara pancasine ya kovare de weşanîyayî. Semedo ke kontekste nê nuşteyî û yê înan ortax o ez muhtewaya înan ra çend fikir û tespitê ke goreyê mi muhîm ê, înan semedê şima neql kena.

**Murad Canşad: Ez kovara Vateyî sey yew kovare ney, sey yew mektebî vînena**

Wexto ke behsê ziwanê nuştekî beno Kovara Vateyî yena merdimî vîr. Ez kovara Vateyî sey yew kovare ney, sey yew mektebî vînena. Mamostayê xo estê, talebeyê xo estê. Kesê ke nika can danî ziwan û kulturê ma, zêde ra zêde nê mektebî ra mezun bîyê. Ez hêvîdar a ke no mekteb hîna zaf kesan perwerde keno, ziwan û kulturê ma yo ke kewto tenga girane ver, asmênê însanetîye ra sey estareyê sere şewdirî berîqîyeno.

**Mutlu Can: Vate vera polîtîkayanê kolonyalîst û asîmîlasyonîstan bîya enstrumanê neyvatişî'**

Goreyê fikrê mi weşanîyayîşê Kovara Vateyî yew gama muhîm a ke ronîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî temam kerda. Yew kovara ke hem vera polîtîkayanê kolonyalîst û asîmîlasyonîstan bîya enstrumanê "neyvatişî" û rolêkê sey wendegehî kay kerdo hem zî bîya yew kovara edebî û folklorîke. Ez bi xo texmîn nêkena ke lîteraturê dinya de sey Vateyî zaf kovarî estbê. Coka ez vana ke aye ziwan û kulturê kurdê kirmancan/zazayan rê xizmetêko zaf muhîm û erjaye kerdo. Vateyêko meşhur o; kovargêrê tirkan vanê ke "Yew kovare heta ke hûmara xoya pancasine nêvejo nêeşkena binê bane/ekolê xo ra nuştox û şaîran biresno". Na çarçewa de Kovara Vateyî hûmara pancasine ra zaf verê profîlêko senî awan kerdo, tîya de îcab nêkeno ez tarîfê ci bikera. Eke ez sey cumleya peyêne vaja; çilkê zelalî ke hetê mamostayê erjayeyî M. Malmîsanijî ra Kovara Tîrêjî de arê dîyayê bi Kovara Vateyî bîyê çemêk.

**Selma Dogu: Vate referans yena girewtiş û sey otorîte qebul bena**

Kovara Vateyî nuştiş û wendişê kirmanckî de yew binge ya. Êyê ke kirmanckî de eleqedar benê kovara Vateyî referans gênê û aye yew otorîte qebul kenê. Ez zî înan ra yew a. Zafê kirmancî (zazayî) rayberîya kovara Vateyî de nuşteyanê kirmanckî nusenê û weşanenê.

**Murad Başaran: Eke ma kirdkî sey yew dînî bivîne, kitabo muqeddes yê nê dînî Vate yo.**

Kirdkî de tesîrê Kovara Vateyî ser o munaqeşe kerdiş xelet o. Eke ma kirdkî sey yew dînî bivîne, kitabo muqeddes yê nê dînî Vate yo. Xebatê bînî zî sey tefsîrê nê kitabî yê. Çunke kamcîn xebate bena wa bibo mumkun nîyo ke tesîrê Vateyî ser ro çin bo. Qet nêbo redaktorê a xebate wendekar/endamê Vateyî yo.

**Umer Barasî: Mîsyonê kovara Vateyî mîsyonêko ontolojîk o**

Seba ziwanan tayê xebat û kovarî estê ke mîsyonê înan ontolojîk o. Sayeya ê çilayanê pîrozan, ê ziwanî bulîkewtişî ra wirzenê payan ser û dest bi rayîr şîyayîşî kenê. Semedê ziwanê mayê delalî zî mîsyonê kovara Vateyî mîsyonêko ontolojîk o. Senî ke kovara "Hawar" seba kurmancan resaya hewara înan.

**Weysel Yildizhan: Mi gore edebîyatê zazakî rîpelanê Vateyî ra veyîya**

Qalêk esta vane "edebîyatê rûsan paltoyê Gogolî ra vejîya" mi gore zî edebîyatê zazakî rîpelanê Vateyî ra veyîya. Vateyî ra ver zî zazakî ameya nuştiş la kovara Vateyî îspat kerd ke her babete de her warî de zazakî şêna qisey biba, keso ke bi na lehçe qisey keno şêno fikr û derdê xo nuştekî biresno wendoxan.

**Bîlal Zîlan: Gelek kesan bi kovara Vateyî ziwano nuştekî şinasnayo.**

Kovara Vateyî, vîst serrî yo ke bi neşrkerdişê tewir-tewir nuşteyan hem standardîzasyon tetbîq kerdo û hem zî bîya wesîle ke ziwano nuştekî mîyanê nuştoxan û wedoxan de vila bibo. Gelek kesan bi kovara Vateyî ziwano nuştekî şinasnayo û dest bi nuştişî kerdo ke înan re yew zî ez o.

** Fikrê nuştoxan û wendoxanê kovare, hûmara 50. ya kovara Vateyî ra ameyî girewtiş*

## Hetê weşangerîye ra kovara Vateyî

Xebata min a bîblîyografya ke ez sey tezê xo amade kena, çarçewaya aye de mi, kovara Vateyî zî tede bi desan hûmarî yê çewres û heşt kovaranê kurdkî (kurmanckî &kirmanckî) tek bi tek analîz kerdî. Bêguman no tecrubeyê mi ra girêdaye ez derheqê kovaranê ma de bîya wayîrê fikrêk. Eke ez na mana de hetê form, muhtewa û taybetîyanê spesîfîkan ra kovara Vateyî ser o vindera bi kilmîye şêna nînan vaja: Kovara Vateyî, bi hawayo sîstematîk çap bîya. Weşanê xo bê mabeyn domnayo û çend îstîsnayî ra teber weşanîyayîşê aye erey nêmendo. Hetê zaftewirîya nuşteyan, dîzayn, redaktasyon û dîyayîşkî ra çend kovaranê zaf başan yê kurdkî yew a. Kovaranê bînan rê sey nêheqî û bêhurmetî nêbo la çar kovarê ke çimê mi de segmentê tewr berzî de ca gênê nê yê: Nûdem, Bîrnebûn, Vate, Nûbihar. Vatişo peyên; Ez hêvî kena ke awa çemê Vateyî serre bi serre hîna zêde biba û ma hûmara seyine zî bivîne

**Rastkerdiş:**

Hûmara verêne de çimeyê 'Sanikanê Mayê Weşanîyayîyan Ser o' de xeletîyêk bîya: "Can, Mutlu, Bîblîyografyaya Sanikanê Kirmanckî (Zazakî), Projeyê Lîsansê Berzî yê Bêtezî yê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kuturê Kurdan yê Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya yê Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî, Mêrdîn, 2010" Ganî wina bibîyêne: "Can, Mutlu, Bîblîyografyaya Sanikanê Kirmanckî (Zazakî), Projeyê Lîsansê Berzî yê Bêtezî yê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kuturê Kurdan yê Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya yê Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî, Mêrdîn, 2015" Ma wendoxan ra uzrê xo wazenê"

# Gebe, hêmayê kelepûra bextiyarîyan



EZÎZ EHMED

Zagros wekî rêzeçiyayên Kurdistanê çendîn hoz û eşîrên kurdî di nav xwe de dihewîne. Di hêla başûrê rêzeçiyayên Zagrosê hozên bextîyarî û lor li herêmên Çarmehalê Bextîyarî, Isfehan, Loristan, Kuhkûlîye û Boyir Ehmed, Xûzistan û Hemedanê dijîn.

Gelê Bextiyarî, bi hûnana “gebe”yan, ku cacimeka mehfûrwarî ya biçûk e, li rojhilatê Kurdistan û Îranê bi navûdeng in. Gebe jibo xemilandina Konên Eşîrên Bextiyarî dihên hûnan. Lê ji dema ku Eşîrên Bextiyarî dest ji jiyana koçerîyê berdane û li zome û zozanan havînên xwe derbas nakin, gebe jî ji giringîyê ketîye. Tenanet di gebeyên ku niha dihêne hûnan de reng û neqşên berê nemane. Çawan ku guhertin bi ser gelê bextiyarî de çê bûne, gebeyên wan jî rastî guhertinên sîmayî hatine.

Gebe yek ji kevntirîn desçinên bextyarî ye ku xwedî dîrokeka gelek qedîm e û bi nexş û nigarên sade dihên xemlandin û zêdetirîn nexşên ku liser Gebeyeyan de dihên çêkirin dar û ajel in.

Hûnana gebeyan ji hûnana mehfûr û berrikan hêsantir e. Jinên destrengîn yên lor û bextiyarî, ezmûn û jiyana nav xwezayê û bintarên rêzeçiyayên Zagros têde nigar dikin. Taybetmendîyên herî girîng yên wê destçinê jî, sadebûn û hebûna rengên dilgeş û zîndî ne.

Hûnana gebeyan têkilîyeka rasterast heye digel siruştê. Ew kesa ku mijûlî hûnana gebeyê dibe xeyalên xwe têde dinexşîne, jiber ku çi nexşeyeka amadekirî liber destê wê de nîne.

Gelên bextiyarî û Lor gebeyan nafroşin û aramanca wan ji hûnana gebeyan ewe ku tiştekî ji bedewîya jiyanê zêde bikin.

Her çiqas ku ev çend sal in çendîn kompanîyên mehfûrçin gebeyên makînî dişînin bazarên Îran û cîhanê, lê qet nikarin sembolên jiyana bextyarîyan têde zindî bikin.

Wêneyên dil, gul û teyran zêdetirîn wêne ne ku di gebeyan de bi awayên rengareng dihên kişandin ku rengên herî balkêş in ku dihên bikaranîn sor, şîn, zer û gevez in.

# Mehfûrên Lorî



Şûnwarên ku li Loristanê hatine peyda kirin, vê rastîyê derdixe holê ku lorên Kurdistanê berî hemî gelên cîhanê mijûlî hûnandina mehfûr û berikan bûne. Berî peydakirina hesin û kanzayan gelê lor bo hûnandina mehfûran cûreyek darên tîj bi navê sîx bi kar anîne û ligor gotina şûnwarnasan, ew cure dar wekî dayika alavên serdema bronzê hatiye nas kirin.

Gelê lor, berî peydakirina kanza û hesinî, nav mala xwe bi kevir û mehfûran xemilandine û xelkê din yên navçeyê hinî hûnandin û rêstinê kirine.


Piştî şerê Cîhanî yê Duyem, lorên rojhilat û bakûrê Loristanê û başûrrojhilatê Hemedanê wate bajarê Melayir û Nehawendê, mijûlî hûnandina baştirîn cûreyên ferş û mehfûrên kurdî bûne û herwiha berik, werîs û gebe jî hûnane, lê lorên Boyir Ehmed, tenê kon û werîs hûnane.

Çendîn cûreyên destrêstî yên gelê lor hene, yên herî giring mehfûr, berik, gebe, somax, şeş dirme, cacim, palas, taçe, gale û xwêdan in.

Piştî şerê cîhanî û hatina kompanîyên mehfûrçin ên rojavayî bo wê deverê û teşwîqa xelkî bo hûnana mehfûr û kirîna wan mehfûran û firotina wan bo derveyî welat, xelkê wê deverê giringîyeka zêde dane hûnana mehfûr û tevnan. Fieldberg derbara rengê mehfûrên lorî de dibêje: “ di destpêka werzê havînê de rîs û hirî dixistin nav mastavê heta ku amadeyî reng girtinê bin.”

Gelê lor pelên daran, ure û nîl jibo reng bikar dianîn. Ji wan mehfûrên ku bo Danîmarkayê hatine firotin yên bi rengên sor, şîn û zer zêdetir berçav bûne. Çavkanîya van rengan, rûnas giyanewerekê biçûk yê sor wekî şemame, qalikê hinaran, pelên gûzan, tirî, tû ye. Rengê kesk yê vekirî di mehfûrên sedsala 20’mîn yên lorî de dihêt dîtin û dibe ku ew reng ji du caran reng kirin yan jî razandina dubare ya bendika zer di nav rengê nîlî de bidest hatibe.

Xurremava û Brûgird di hûnana mehfûrên lorî de du navend û bajarên navdar in û taybetmendîyên mehfûrên Xurremavayê ew e ku pir qehîm in. Ji bajarê Brûgirdê kargehên çêkirina reng, qalik, gulê hinarê, rûnas û madên xwezayî yên din bi awayê kom bo bazarên Îran û Ewropayê dihêne şandin.



# Ciwanekê Kurd Zêrên Sor dişîne Bazarên Rojhilat



Malbateka Kurd li gundê Qadirmerz yê ser bi Bajarê Dêgulan, baştirîn cûreyên zeiferan (safran), ku li Îranê bi Zêrê Sor naskirî ye, berhem dihîne.

Teyib Qadirmerz ciwanekî temen 21 sal û xelkê gundê Qadirmezê, bi hewl û şiyana xwe kariye pîşeyekê pirdahat û nû jibo malbata xwe û rûniştvanên gundê xwe peyda bike û berhema wê bişîne bazarê.


Teyib di derbara hizra çandina zeiferanê de dibêje: bo cara yekem sê salan berî niha, bi alîkarîya xanima Seidî li bajarê Isfehanê, min xwast guhetinê di berhemên çandinî yê Kurdistanê de bikim û bextewerane encama wê jî baş bû.

Navbirî diyar kir, ku yek ji sedemên wê hizrê, ew e ku, bajarê Sine û rojhilatê Kurdistanê wekî berê ava wê nemaye û roj bi roj ber bi çolbûnê ve diçe, loma wî ew berhem çandin. Vî berhemî zêde pêdivî bi avê nîne û sûda wê baş e, herwiha dikare delîveyên kar jibo jinan jî dabîn bike. Jixwe jin karê komkirina zeiferanê ji mêran baştir dizanin; karê berhevkirina zeiferanê pêdivî bi sebrê ye, çunkû zeiferan pir nazik e, divêt lê miqat bin.



Teyib derbara azmûna çandina zeiferanê di salê destpêkê ji Basê re eşkere kir û got: “sala yekem qazanca min baş nebû, lê min sala Dûyem karî 200 graman hilberînim û sala sêyem berhema min gihîşt kîloyek û sêsed graman. Îsal jî asta hilberîna min 2 kîlo û 700 gram e. Ev jî cihê keyfxwşîyê ye ku her sal asta berhema min di zêdebûnê de ye û di salên pêş de dê bibe zêdetir ji 6 kg.

Teyib li derbara çandina zêrê Sor de zêde kir û ragihand: Ez bo her çar donim zevî nêzîkî deh hezar dolaran dimezêxim û sê kes di kêlgehên min de kar dikin.Di dawîyê de Teyîb hêvîdar e ku cotkar liser wan zevîyên çandî yên ku ava wan kêm e, mijûlî çandina zeiferan bin û Kurdistanê bikin cihê hilberîna vê berhema giranbiha.





## Du pirtûk û awirek li Ewropaya Rojhilat

# Sefernameya G.G. Márquez li Ewropaya Rojhilat




CIWANMERD KULEK

28ê Çirîya Pêşîn, li Budapeştê, komek xwandekar di meydaneka piçûk a tijî kulîlk a li rexê Çemê Tûnayê re dibihurin û liber peykerê Sándor Petrőfi, helbestkarê netewyî ê Macaristanê, jibo ku hêzên Sovyetê ji welatên wan derkevin druşmina didin. Yek ji wan derdikeve ser wî peykerî û du saetan dide navê, gotarekê pêşkêş dike. Gava ku gotara xwe diqedîne û dadikeve, ew bûlvar tijî bûye bi mêr û jinên Bûdapeştî, hemû sirûda neteweyî ya Petrőfi dixwînin. Ev dibe destpêka serhildanekê lihember hikûmeta Komara Gel a Macaristanê. Piştî belavbûna serhildanê hikûmet dikeve û Partîya Gelê Karker a Macaristanê, ku desthilat bû, razî dibe ku li ser vekişandina hêzên Sovyetê guftûgoyan bike, lê piştre Sovyet raya xwe diguhere û bi hêzeka mezin Bûdapeştê dagîr dike. Yekîneyên ku ji 80.000 kesî pêk hatine êrîşê dibin ser serhildêran û tankên rûsan avahîyên ku xelk xwe di wan de disitirînin dirûxînin. Ligor daneyên fermî yên wê demê, di maweya çar rojên serhildana kesên ji polîtîkayên hikûmeta bindestê Sovyetan nerazî de, 5.000 kes dimirin, 20.000 jî birîndar dibin. Yekîtîya Sovyetê piştî vê cengê karîgerîya xwe ya li ser Bloka Rojhilat xurttir dike û bi dirêjahîya deh mehan salix û sûlixên Bûdapeştê bi temamî ji dinyaya biyanî, "Rojavayî," qut dibe; kesek ji derve nikare here bibîne, kesek ji hundir jî nikare devê xwe veke û behs bike. Piştî deh mehan hikûmeta Macaristanê qebûl dike ku desteyeka çavdêran a ji 18 kesan pêkhatî bihêt serdana Bûdapeştê bike. G.G. Márquezê ku di nav wê delegasyonê de bû behsa tirs û bêewlehîya xelkê dike, ku çawan xwe ji axaftinê dûr dikin. Nivîskar dizane qada ku di serdema herî dijwar de berdevkîya hizrên çewsandî dikir li kû ye û berê xwe dide tuwaleta barekê. Li wir tiştên ku vî xelkê bêdeng nediwêrî bigota li daşirê, li ser dîwarên cihê destavê dibîne. Druşmên dijî Janos Kádár (Serokê Hikûmetê), dijî rûsan û dijî wê komkujîyê li wir hatibûn nivîsîn. Axaftina liser vê meselê di nav xelkê de û liber çavê kesên dî heta ji sîh salî zêdetir li Macaristanê qedexe dimîne. Geriyana G. G. Márquez wekî rojnameger û çavdêrekî li Ewropaya Rojhilat, li Bloka Rojhilat, yan jî Perdeya Hesinî, ji Berlîna Rojhilat bigire heta bi Prag, Warşowa, Moskow, linav "demokrasîyên gel", di vê qonaxê de bi dawî dihêt. Ew geriyan û çavdêrî paşê bi navê "Geriyana li Ewropaya Rojhilat" wekî pirtûk çap bû. Erê min tiştên ku liser wî rûpelê di dîroka Macaristanê de li jor nivîsîn hemû ji vê pirtûkê wernegirtin; divêt mirov bibêje, ji vê bêhtir di pirtûkê de hene.

> "Di pirtûkê de serhatî û azmûnên mirovan dibin ders û dersdarên herî girîng. Bi xwandina wê re gotineka kurdî dihêt bîra mirovî, ku kurdên, ku êş û kul, dem û dewranên xedar û bi xezeb dîtine her dem bi dilekê şewat dibêjin: "Bila ew roj herin û bes vegerin!"

## Balexaneyên cîhanê

# Çend avahîyên bilind li Manhattanê



Gava di 4ê Nîsana 1973yan de lêkirina wan qediya û hatin vekirin, Bircên Cêwî (Twin Towers) yên li Manhattana Jêrîn a parêzgeha New Yorkê, DYA, bûn bilindtirîn avahîyên li cîhanê. Bircên ku wekî Navendên Bazirganî ên Cîhanê mazûvanîya karên pirr-pere û bîznes (business) dikirin, yek ji wan 415 metir, a dî jî 417 metir bilind bû. Manhattana ku li cîhanê wekî paytexta kultur, fînans û bazirganîyê dihêt qebûl kirin, ligor belgeyên dîrokî, kolonîstên Holendî bi 60 gulden (florîn) ji Emerîkîyên xwemalî (native/niştecî/resen) kirîn. Manhattana ku li ser duyemîn rûberê herî biçûk di nav bajarên DYAê de avabûyî, îro milk û avahîyên wê ji her deverên dî yên dinyayê biqîmettir in. Jiber kêmbûna zevî, avahîsazî ne bi berînî lê bi bilindî pêş ketiye. Bi vî rengî mimkun bûye ku li ser zevîyeka sînorkirî mazûvanîyê ji nifûseka mişe re bike. Ligor daneyên 2015an li her kîlometre çargoşeya vî erdê biçûk 27.826 kes dijîn û bi vî awayî Manhattan dibe yek ji beldeyên herî qelebalix û biz (ji alî gelheyê de tîr/zahf) yên cîhanê. Ev devera ku bi avahîyên xwe yên bilind êdî li pêş çavê her kesî bûye wekî kartpostalekê, di 2001an de tûşî êrîşeka terorî hat û avahîyên wê yên bilind, Bircên Cêwî, pey der pey rûxiyan. Di maweya zêdetirî deh salan de avahîyên Navenda Bazirganîyê ya Cîhanê cardî hatin ava kirin û bilindtir kirin lê êdî ti ji wan dê nebûya avahîya herî bilind a cîhanê.

**Çiqas aborî, ewqas bilindbûn?**

Ligor efsaneyê, mirovên qedîm ên piştî Tofanê, ku hemî bi zimanekî diaxivîn, biryar didin ku bajarekî ava bikin û bircekî lêbikin ku bigihîje esmanan. Xweda vê xebata wan dibîne û pir aciz dibe jiber ku vê lihember xwe wekî bêhurmetîyekê dibîne, lewma radibe zimanê wan mirovan ji hev cuda dike û mirovên ku nema ji hev fahm dikin nikarin birca xwe biqedînin û hemî ji hev belav dibin.

Îro li deverên curbecur ên cîhanê ên ku mirov lê belav bûne, li navendên girîng ên karsazî û fînansa cîhanê avahîyên ji hev bilindtir, ber li esmanan, berbijor de hildikişin. Li cîhana ku buhayê $ 1.200.000.000.000.000 mal û nirx lê hatiye holê êdî ji dêvla bircên jibo çavdêrîyê û kelehên berevanîyê ên li dora bajaran, van avahîyên ku aborî, fînans û bazirganî wan qat bi qat bilindtir dike hêz û zengînîyê raber dikin.

**Dehê pêşîn**

Di lîsteya deh avahîyên herî bilind ên cîhanê de, Navenda Bazirganî a Navneteweyî ya li Hong Kongê li rêza dawî ye, lê bi bilindbûna xwe ya 484 metirî nêzîkî 70 metirî bilindtir e ji Bircên Cêwî ên di 1973yan de li Manhattanê hatibûn avakirin û wê serdemê ji her avahîyeka dî a li tevahîya cîhanê bilindtir bûn.

*-Navenda Fînansê A Cîhanê a Şenghayê, Çîn, 492 m*
*-Taipei 101, Taywan, 509 m*
*-Navenda Fînansê CTF, Çîn, 530 m*
*-Navenda Bazirganî a Yek Cîhanê, New York, 541*
*-Birca Lotte World, Koreya Başûr, 555 m*
*-Navenda Fînansê Ping An, Çîn, 600 m*
*-Birc el-Beyt Clock Tower, Mekke, 601 m*
*-Birca Şanghayê, Çîn, 632 m*
*-Birc Xelîfe, Dubay, 828 m*

Di vê lîstê de ji dehan yek kêm e û wexta ew têkevê ê hemîyên dî li paş xwe bihêle. Birca ku di vê lîstê de dê bikeve serî û bibe yaa herî bilind dê di 2020an de biqede û heta wê gavê dê milyardek dolar li avakirina wê bihête mezaxtin. Gelo ew dê li kû be? Ew jî dê li Dubayê be û dê rekora bilindbûna Birc Xelîfe, ku ew jî li heman deverê ye, bişikêne.

**Ji cîhana li ser rûyê erdê berev cîhana esmanan**

Çûna mirovî ser rûyê heyvê bo cara yekem di sala 1969an de bû yek ji nûçe û geşedanên herî girîng ku mirovên li ser rûyê erdê dibihîstin. Di nêzîkî pêncî salên ji wê demê heta îro de, peyk û satelît û cîhazên dîtir ên li esmanan hatin bi cih kirin ne tenê bo naskirina cîhanê, lê herwiha bo birêvebirina wê jî gelek guhertin bi xwe re anîn; evca ji warê ragihandinê bigire heta bi aborîyê. Xêrayî û tawa ku van geşedanan anî xist nav berhemhênan û dahênana nirxan, di aborîyê de reqemên "astronomîk" xist ferhenga mirovatîyê. Ev reqem êdî di kozikên berê de hilnayên û di avahîyên mezintir de dihên sewq kirin û gerandin. Bi zimanê hevpar ê pere û piyaseyan mirovahî bihust bi bihust ber bi esmanan ve diçe û vê carê xweda bêdeng in. Eger mirov zengînîya ku mirovatîyê afrandiye gişî bike pere û wî pereyî gişî hûr bike, bike yek dolar û wan yek dolaran li kêleka hev rêz bike, ew şerîtên banknotan dê 170 carî herin heyvê û werin.

# Svetlana Aleksiyeviç û dawîya mirovê sor

Komîteya Nobelê a Edebiyatê bi bijartina wergirên Xelata Nobelê ev du sal in biryarên pirr serincrakêş û hêvînekirî dide. Ê min, ji Bob Dylanê stranbêj ku Xelata Nobelê a Edebiyatê a 2016an wergirt bêhtir, Svetlana Aleksiyevicha rojnamevan, ku di 2015an de bi vê xelata bihagiran qedrê wê hat girtin, bala min kişand. Liser wî sînorê rojnamevanî û nivîskarîyê, gotin û guhdarkirinê, dîtin û lêgerînê qiset û kronîkeka heja derxistibû holê. Bi saya hevpeyvînên kesên serdema Sovyetan jiyayî, li giyanê mirov, li jiyana mirov, li tarîxa "wî rûsî", wî "tak"î geriyabû ku tarîxên mezin pê 'emel nake. Behsa kolektîfkirinê, desteserkirina milkan, sirgûnkirina gelan dike û çawan di wê serdemê de nikarîbûn qala van tiştan bikin. Şahidîya demê wekî ava bendava xwe teqandî boş, bi gujegujeka diltezîn diherike: Gundîyên Ukraynayî yên ku jiber dijî kolektîfkirinê ne û naxwazin herin kolxozan bi birçîhiştinê dihên ceza kirin û kuştin, kes namîne ku mirîyan veşêre. Eger du hesp û du çêlekên te hebûna navê te dibû "kûlak" û berê te didan Sibîryayê. Dayik di riya zilm û sirgûnê de jibo ku zarokên wan wê êşê nebînin û nekişînin di rê de wan dixeniqînin. Qiseteka nas e lê zor û zehmet e: çawan her kesî xwe lipişt perdeya bêdengîyê qincilandibû û tiştên gava paşê, piştî ku kutayî li ba û agirê pêşî, pêla wê xeyal û romantîzma pêşî a şoreşê bihata, her tişt bihatana axaftin ê serpêhatîyan ew bibehitandana. Piştî salên 1980yî, di serdema serokatîya Gorbaçov de, bi reforman derzek li wê hişkîya berê dihêt xistin, arşîv vedibin û tiştên ji wan hatibû veşartin yan nikaribûn biaxivin, gotin û siyasetên pêşengan dibînin:

"Divê em ji 100 milyon mirovên ku li Sovyetistanê dijîn 90 milyonê wê bikişînin alî xwe. Ne hewce ye mirov bi ên dî re biaxive - gerek e mirov wan ji holê rake." (Zinovyev, 1918)

"Divê mirov 1000 axa û dewlemendî daleqîne (teqez wan daleqîne ku xelk bibîne)... nanê gişan ji destê wan bistîne, wan êsîr bike... Mirov wisa bike jibo ku heta ji sed kîlometreyî jî xelk bibînin û bilerizin..." (Lenîn, 1918)

"Moskowa hema bêje ji birçîna dimire." (Profesor Kuznetsov ji Trotskî re dinivîse)

"Ev ne birçîbûn e. Dema Tîtus Orşelîm zeft kir, dayikên jihû zarokên xwe xwarin. Dema min dayikên we mecbûr kirin ku zarokên xwe bixwin, wê demê hûn dikarin werin bibêjine min "Em birçî ne!"" (Trotskî, 1919)

Heta Stalîn sax e herkes ken çi ye ji bîr dike. Di serdemeka (1937-1938) ku 20.000 rewşenbîr li polîgona Butovayê (Gundekê nêzîkî Moskowê) dihên gulebarankirin û kuştin de, çawan ji tirsan her kes dibe sîxur û muxbirê hev. "Çima ez nehatim girtin? Dibe ku te jî bigirin, dibe ku te jî bişînin kampê. Partî dixwaze, Partî emir dike." Apê Yurayê ku tu bi zarokên xwe re dibirî masîyan bavê te gilî dike, dihên bavê te dibin, heta deh salan dê nema bihêt, piştî ku hat dê nema bikene; xaltîka Olya gilîyê apê te dike û dihên wî jî dibin, lê ew nema vedigere.

Ev pirtûka ku bi her kesî re diaxive, şahidîya wê dike ku çiqas hatiye bawer kirin, çiqas nehatiye axaftin, çiqas hatiye veşartin. Raber dike ku ew kesên hatin fêr kirin ku jibo azadîyê bimirin çawan kesî ew fêrî azadîyê nekirin û ji azadîyê mehrûm man, jiber wê yekê kultura rûsî a sedsala bîstê di metbexê de, li civatên xwe bi xwe, bi heval û dostên nêzîk re geş bû. Di wê seqaya dijwar û metirsîdar de encaq karîbûn bêhna xwe bi meselok û henekên wiha derxin: "Ên ku Marks dixwînin dibin Marksîst, ên ku ji Marks fahm dikin dibin antî-Marksîst." Li welatekê ku deryaya petrol û gaz û madenan e, çiqas diqîrin û dinivîsin "Azadî! Azadî" ewqas zû nan û penêr, xwê û şekir ji bazarê winda dibin, mirovên ji civînên komsomolan û xebatên polîtîk dikerixin û his dikin ku sosyalîzmê ew şeloşehtî kirine, kesên xewna wan lixwekirina blue jeansan (şalikên kot) û xwandina pirtûkên dîtir e, Tzarîtîya di sê rojan de dawî lê dihêt û komunîzma di sê rojan de dawî lê dihêt, hêvî û xeyalên di serî de jibo komunîzmê dihatin kirin çawan piştî 1990an bi heman awayî ji kapîtalîzmê dihên kirin, kevana jiyanê a di navbera împeratorîya mezin û mirovên piçûk de hatî rakişandin hemû bi jiyannameyên taybet, takekes û rojane ji devê mirovan dertên û ne tenê sînorên edebiyatê, sînorên rojnamevanîyê jî digihînin perrên dûrtir. Nêzîkbûna li mirov, zeftkirina kul û gotina di dilê xwe de hiştî, tomarkirina dengê resen û şexsî. Di pirtûkê de serhatî û azmûnên mirovan dibin ders û dersdarên herî girîng. Bi xwandina wê re gotineka kurdî dihêt bîra mirovî, ku kurdên, ku êş û kul, dem û dewranên xedar û bi xezeb dîtine her dem bi dilekê şewat dibêjin: "Bila ew roj herin û bes vegerin!"

# Dengê kurdên Australyayê:
# Mistefa Xelîl

DILŞAH AMEDÎ

Mistefa Xelîl bi salan e li bajarê Sidney ya Australyayê bêjerê radyoyê ye. Ew ji bajarê Kobanê ya rojavayê Kurdistanê ye. Di sala 1980ê de koçî Australyayê dike û nêzîkî 37 salan e bi malbata xwe re li Austuralyayê jiyana xwe didomîne.

Piştî niştecihbûna li Australyayê di radyoya 2RDJFM de dest bi bêjeriyê dike û ji wê demê pêve dibe dengê kurdên Australyayê. Xelîl piştî vê di radyoya Skidrowê de dest bi kar dike. Xelîl di sala 1991an de bi navê 2000 FMê radyoyekê dadimezrîne. Ew bi salan e di vê radyoyê de bernameyan pêşkêşî kurdên Australyayê dike.

Bêjerê kurd Mistefa Xelîl bersiva pirsên heftenameya Basê dide û ji xwanerên heftenameyê re bahsa karê radyoyê dike.

**We çawa û kengî dest bi karê weşangeriya radyoyê kir?**

Dema ku em hatin Australyayê, hejmara kurdan pir kêm bûn. Tenê 50 malbatên bakur û 3-4 malbat rojavayê Kurdistanê hebûn. Lê wê çaxê kurdên Başûr û Rojhilat qet tunebûn. Hejmara me gelekî hindik bû; lê dîsa jî gelek çalakî dihatin kirin û me Newrozê pîroz dikir; xwepêşandan dikir; beşdarî di festîvalên folklorê de dikir. Armanca me tenê ew bû ku em kurdan bi Hikûmeta Australyayê bidin nasîn. Heta wê çaxê kesî kurd nas nedikirin. Gava me digot: 'Em kurd in.' Berpirsyarê Australyayê digot: "Kurd çi ne; Kî ne?" Me digot: "Zimanê me qedexe ye. Hebûna me qedexe ye." Kesî bawer nedikir. Kesî nedibihîst kurd çi û kî bûn.

Ji aliyê din ve li Australyayê kurd gelek belav bûn û li derên cuda dijiyan. Wê demê TV û radyo yên me tunebûn. Me jî xwast bernamyekê çê bikin ku kurdan bigihînin hevdu. Armanceka din û giring ew e ku navê kurdî bikin nav zimanên din. Çawa zimanên erebî, îtalî, fransî hene, me dixwast nîşan bidin ku kurdî jî heye. Herwiha kurd ji welatê xwe dûr ketibûn û me dixwast li xeribiyê em wan nêzîkî hev bikin.

Min di sala 1986an de bi vekirina 2RDJFM dest bi karê radyoyê kir û niha di 2000FMê de berdewam dikim.

**Radyo çawan beşdarî jiyana kurdên Australyayê bû?**

Li Australyayê Opera House heye û grupên folklorê yên navneteweyî li wêderê beşdarî festîvalan dibin. Wê çaxê me bi navê Kurdistanê grubek saz kiribû. Em bi kincên kurdî beşdarî vê festîvalê bûn. Armanca me ew bû ku xelkên Australyayê kurdan nas bikin.

Piştre em fikirîn ku vekirina radyoyê baştir e. Jiber ku heger radyoyeka kurdî hebe, kurd dê baştir bihêne nasandin û bi vî awayî dê nêzîkî hevdu bibin.

**Tu li radyoyê çi cûr bernameyan amade û pêşkeş dikî?**

Hemû bernameyên min derbarê kurdnan û zimanê kurdî de ne. Ez nûçe û raportan pêşkêş dikim û bi rêber, nivîskar, rewşenbîr û hunermendên kurdan re hevpeyvînan çê dikim. Dema ku li Kurdistanê bûyer pêk dihên yan jî rewşeka awarte hebe, bi wan re peywendî çê dikim. Bo mînak heger li bakurê Kurdistanê bûyer rû bide, li wê derê hin kesan re dikevim pewendiyê û zanyarî yan raya wan werdigirim û hildiguhêzim bo kurdên Australyayê.




> Li Australyayê 30 sal zêdetir e radyoyên kurdî bûne dengê kurdan û kurdan dide nasîn. Ji wan yek jî radyo 2000 FMê bi bêjerîya Mistefa Xelîl e. Xelîl 30 sal berê jibo kurdên Australyayê li Sidneyê radyoyek damezrand û bi salan e bo kurdan bernameyan pêşkêş dike û wan dide nasîn.

## Kurdên ku li Kurdistanê dijîn çawa dest bi vekirina radyoyan kirin? Sedem çi bû?

Li Kurdistanê berê dezgehên radyoyê tune bûn. Li hemû beşên Kurdistanê şer û têkoşîn hebû. Li başûrê Kurdistanê Seddam êrîşî kurdan dikir. Kurdan li çiya li dijî Seddam şer dikirin. Dezgehên wan ser çiya bûn. Dijminên kurdan hebûna kurdan qebûl nedikir. Di navbera 20 salên berê û niha de gelek cudahî hene. Berê tenê li hindek paytextên dûrî Kurdistanê radyoyên kurdî hebûn, paşê du sê radyoyên kurdî li Iraq, Îranê û Ermenistanê vebûn. Ango radyo bi însiyatîva ne-kurdan jibo kurdî vedibûn, lê di van 20 salên dawî de kurdan karî dezgehên medyayî yên bihîzbar wekî radyo û dîtbar wekî televîzyonan vekin. Helbet pir dereng hatin damezrandin. Herwiha kurdan xwe di warê çapemeniyê de pêş xistin. Li hemû cihên Kurdistanê îro çapemeniya kurdan heye. Bo mînak li Başûr hem kare radyo û hem jî televîsyonê pêş ketiye. Bêjerên gelekî baş hene.

Lê Australyayê çapemeniya kurdan tunebû. 30-40 sal berê li vê derê ti çapemeniyek tune bû ku behsa kurdan bike. Bo mînak digotin rojnameyeka Australyayê behsa kurdan kiriye, em lê digeriyan û me digot: "Gelo derbarê kurdan de çi gotine? Çawa behsa me kirine?" Dema ku me navê kurd û Kurdistanê didît çawa kêfa me dihat. Em gelekî kêfxweş dibûn.

Her çiqas liber kurdan hin kêşe û astengî hebin jî, çapemenî dikare xizmeta gel bike. Çawa? Teknolojî îro gelekî pêş ketiye. Heger teknolojiyê baş bi kar bihînin, vê demê dikarin zêdetir kêşe û derdê gelê xwe bi raya giştî û cîhanê re rave bikin. Di heman demê de dikarin geşedana folklor, ziman, netewe û mafên xwe pêş vê bibin. Jiber vê gelek fersend liber kurdan hene. Lê divê kurd wan fersendan ji dest nedin û bikar bihînin.

Ji aliyê din ve heger em li dîroka kurdan binêrin, sedema pêşneketina wan jiber wan bixwe ye jî. Çunkû kurdan zordarî lidij hevdu kirine. Li hemû parçeyên Kurdistanê wisa ye. Sedema dabeşbûn û parçebûna wan ew e. Jiber vê hemû kurdên cîhanê xwe pêş bixin û nav, folklor, ziman û kêşeyên kurdan nîşanî cîhanê bidin.





## Li Australyayê yekemîn radyoya kurd kîjan e? Çi wext hat saz kirin?

SBS yekem radyoya kurdan e ku li Avusutralyayê hatiye saz kirin. Radyo ji aliyê Mamoste Şahînê Bekirê Soreklî di 1983an de hatiye ava kirin. Berê navê wê QEA bû û niha jî bi navê SBS weşanê dike. Min jî di sala 1986an de radyoya Skidrowê vekir û bi damezrandina 2000 FMÊ di sala 1991an de karê weşangeriya radyoyê berdewam kir. Radyo nûnertiya hemû beşan dike; bi her du zaravayên kurdî ango kurmancî û soranî bername dihên pêşkêş kirin. Armanca wê xizmeta hemû beşên Kurdistanê ye.

**Kurdên Australyayê derbarê radyo û bernameyên we de çi difikirin?**

Bêguman bernameyên radyoyê bi dilê gelekan ji civaka kurd li Australyayê ye. Çunkû radyo jibo wan e û aîdî wan e. Radyoyê mafê her kesî daye û rê dide herkes dengên xwe belav bike. Radyo bi dilê herkesî ye. Jiber ku bêlayan e; lê bêguman bi dilê hin partîyên siyasî nîne.

**Li Australyayê jiyana kurdan çawan e?**

Bêguman Australya welatekê demokrat e û koçberên ji gelek çandan têde dijîn. Di destpêka salên 1980an de civaka kurd li Australya wekî yek malbatê dijiyann û hevgirtî bûn. Lê bi derbasbûna salan re hejmara kurdan jî zêde bû û mixabin dema hejmar zêde bû partîyên siyasî jî ketin nav civakê. Bi hatina partîyên siyasî bandorek li ser civakê peyda bû û parçebûn jî çê bû.

Bi şêweyeka giştî rewşa civaka kurd li Australyayê baş e. Lê cihê xemginîyê ye ku kurd ne wekî civakên wekî ermenî yan cihûyan yekdeng û yekhelwêst in. Ji lewre ya herî baş ew bû ku dengek hebûya, vê yekê dê pêşî ji parçebûna di nav partîyên kurdan de bigirta. Lê kurd heta niha negihiştine wê qonaxê ku berjewendîyên neteweyî bidin ser berjewendîyên hizbayetî.

**Hûn rewşa radyoyên li Kurdistanê çawan dinirxînin?**

Başûrê Kurdistanê ji sala 1991an ve di bin rêveberiya kurdan bixwe de ye. Li wir çapemenî û TVyên kurdan zêde bûne. Lê jibo Rojavayê ez nikarim heman tiştî bibêjim. Herçî Rojava ye, zexta hikûmeta Sûriyê liser kurdan hebû û kurd wekî kurd nedihatin hesibandin. Piştî şer Kobanî û Qamişloyê û çend deverên kurdan ketine destê hin aliyên siyasî. Piştre kurdan li Rojavayê hêdî hêdî dest bi vekirina radyoyan kirin. Herçende ez bawer dikim ku ew jî dê demkî bin. Jiber ku niha li Sûriyê rewş ber bi aramîyê diçe û rewşa hikûmata Sûriyê dê baş bibe. Di navbera kurd û hikûmeta Sûriyê de ti rêkeftin tune ye û gelek arîşê hene. Jiber vê dê dîsa liser kurdan zextan çê bikin û wekî berê azarê bidin wan.

Rêveberiya Rojavayê di dest PYDê de ye û PYD gelek şaşiyan dike. Siyaseta PYDê ne di berjewendîya kurdan de ye. Heta niha siyaseta kurd li rojavayê Kurdistanê negihiştîyê wê qonaxê ku berjewendîyên kurdan bike pêşkîya xebta xwe, di şûna berjewendîyên gelê kurd de berjewendîyên partîyan dihêt parastin. Di nav siyaseta kurdan de arîşê gelekî zêde ne û bi taybetî li Rojava gelek kes siyaseta PYDê rexne dikin. Ez bawer dikim ku Radyo Qamişlo û Kobanê dê katî bin. Helbet ez hêvî dikim ku ev tişt pêk nehêt. Lê heger wekî ku min gotiye bibe, li Rojavayê Kurdistanê weşanên radyoyên kurdî jî dê bi dawî bibin.

Ez hêvî dikim ku Bakur pêş bikeve. Niha li Bakurê Kurdistanê di navbera kurd û hikûmeta Tirkiyê de kêşe hene. Ez bawer dikim, heger kurdên Bakur bikaribin kêşeyên xwe bi awayekê siyasî û aştî çareser bikin, dê di hemû waran de ser bikevin. Êdî ne dem û dewrana şerê çekdarî ye. Başûrê Kurdistanê mînaka herî mezin bû ku bi salan şer kirin. Lê dawîya dawîyê hemû tişt bi awayekê aştiyane çareser bûn. Lê Bakurê Kurdistanê gelek arîşê hene, lê ez hêvî dikim ku bi awayekê aştîyane û bi danûstandinan ev arîşe bihên çareser kirin.

Rewşa siyasî ya Kurdistanê pêşmercê rewşa weşangeriya radyoyê ye, heger em niha li radyoyên her çar perçeyên Kurdistanê binêrin radyoyeka serbixwe tune ye. Jiber ku radyo wekî partîyê ye û ligor ideolojîya wan tevdigerin û kar dikin. Hêvîya min ew e ku hin dezgehên serbixwe hebin û bi hisên neteweyî û kurdayetî kar bikin û ji îdeolojîya partîyan dûr bikevin. Ya mirovî dilgiran dike ew e, ku niha jî ji 95 sedî dezgehên me di şûna xizmeta gelê xwe, ya hizban dikin. Jiber wê em nikarin ser bikevin. Çunkû propagandaya îdeolojî û siyasta partîyên xwe dikin. Ez hêvî dikim ku bi awayekê profesyonal jibo berjewendîyên neteweyî û gel kar bikin.